kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 71 | 2018



bîrnebûn

ISSN 1402–7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.
Çar mehan carekê derdikeve.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 71 | 2018
Ansvarig utgivare: Alî Çiftçî
Editor: Ali Çiftçî, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê
Alî Çiftçi, Xizan Şîlan, Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür
Mem Xelîkan, Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl), Mustefa Reşid,
Mehtap Îdelî, Ecevit Yildirim, Hesen Huseyîn Denîz,
Mistoyê Heco, Hizir Akbîna, Memduh Selîm, Xelîl Birinî,
Şerwan K., Amed Tîgrîs

Adress
Navnîşana li Swêdê
Box: 8121,
SE 163 08 Spånga/Sverige

E–post
info@apectryck.se

Internet:
www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:
Ewrupa: Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049–172 298 24 51

Türkiye
İstanbul
Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 5 TL

Abone ji bo du salan
Swêd: 400 SEK • Almanya 50 Euro
Welatên din ên Ewrupayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:
(Bîrnebûn) bankgiro: 402–2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê
APEC, "Bîrnebûn"Bankgiro–Stockholm/Sweden
BIC/SWIFT: DABASESX
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Tryck: Apec



Îna Heselmên li Xelka Jor(Qerecdax), niha jê ra dibêjin Îna Mixê Usif

Wêneyê berga pêşî:
Berhema boyaxa rûnî, ya Lukman Ahmad
Wêneyê berga paşî:
Şêra Eyşê, ji malpera xalko.ezkime.com

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

www.arsiv.mezopotamyadi.org



Celadet Alî Bedirxan hertim dixwest berê xort û keçên kurd bide xebat û têkoşîna ji bo pêşketin û rizgariya Kurdistanê û hewl dida xortên kurd nekevin jêr kartêkirina kesên dixwazin xortan sar bikin û dilê wan ji kar û xebatê bihêlin. Di hejmara 18an a kovara Hawarê de, ku sala 1933an li paytexta Sûriyê, Şamê derketîye, Celadet wiha dibêje:

„Xorto! Holê bixebite, an bixwe çêke an alîkariya ewan bike ko çêdikin, ava dikin.

Lê eger tu nikarî bi xwe çêkî, ne jî alîkariya çêkiroxan bikî hingê bi ên çêkirî şa û kêfxweş bibe. Ji ber ko ew ji bona te, ji bona miletê te hatine çêkirin. Nav di wan bide, wan bipesinîne. ...

Wekî tu dixebitî dexeskar ji dora te kêm nabin. Tu guh mede wan, gotinên wan damêne ber dilê xwe. ...

Xorto! Xebata te mîna dengekî ye. Ma deng bi pifkirinê tête vemirandin. Keda te mîna çirayekê ye. Ma çira kengî bi deng û pêjinê temirî ye. TU her bixebite, qet mesekine, karê xwe bi ser xe. ...

Dengê te ko ji pifkirinê natirse, ew ê her bilindtir, çira te ko bi pêjinê nalerize ew ê her geştir bibe. ...

***

Keçê! Di van gotinan de para te ne hindik e.
Keçê! Tu keça wî camêrî, jina wî mirovî, dîya wî xortî yî ko min şîret lê kir û kar û xebata wî şanî wî da. Belê keçê, ev xortê ha xortê te ye. Di mehdikê de te ew lorand. Di dawetê de te jê re tilîland. Di roja qewmandinê de te nav di wî da. Ji xwe tu berekê wî yî. ..."

Şîreta Celadet Bedirxan bo keç û xortên kurd

bîrnebûn

ISSN 1402–7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.
Çar mehan carekê derdikeve.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 71 | 2018
Ansvarig utgivare: Alî Çiftçî
Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê
Alî Çiftçi, Xizan Şîlan, Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür
Mem Xelîkan, Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl), Mustefa Reşîd,
Mehtap Îdelî, Ecevit Yildirim, Hesen Huseyîn Denîz,
Mistoyê Heco, Hizir Akbîna, Memduh Selîm, Xelîl Birinî,
Şerwan K., Amed Tîgrîs

Adress
Navnîşana li Swêdê
Box: 8121,
SE 163 08 Spånga/Sverige

E–post
info@apectryck.se

Internet:
www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:
Ewrupa: Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049–172 298 24 51

Türkiye
İstanbul
Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 5 TL

Abone ji bo du salan
Swêd: 400 SEK • Almanya 50 Euro
Welatên din ên Ewrupayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:
(Bîrnebûn) bankgiro: 402–2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê
APEC, "Bîrnebûn"Bankgiro–Stockholm/Sweden
BIC/SWIFT: DABASESX
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Tryck: Apec



Îna Heselmên li Xelka Jor(Qerecdax), niha jê ra dibêjin Îna Mixê Usif

Wêneyê berga pêşî:
Berhema boyaxa rûnî, ya Lukman Ahmad
Wêneyê berga paşî:
Şêra Eyşê, ji malpera xalko.ezkime.com

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

www.arsivakurdi.org

Naverok

Ji bîrnebûnê 6
Alî Çîftçî

Rêwîtiya hêviyê 8
Mehtab Îdelî

Hosteyê hostan 12
Hizir Akbîna

Helbest 21
Seyfî Doğan

Reşo 22
Ecevît Yildirim

Herim 28
Mem Xelîkan

Pêkonok 29
Hizir Akbîna

Li welatê min bihar tê 31
Hesen Huseyîn Denîz

Neynika qederê 33
Xizan Şîlan

Çîroka mişkên kor 34
Mistoyê Heco

Navên merivan ên taybet 36
Memduh Selîm

38 Pezname
Nuh Ateş

51 Sê kes û sê kilam
Amedekar: Muzaffer Özgür

54 Cinavka pirsên "**kî, kê**"
Xelîl Birînî

59 Bermekiyên kurd di kûraniya dîrokê da-5
Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

63 Efrîn
Mem Xelîkan

64 Helbest
Seyfî Doğan

65 Bi Hecoyê Rişti ve hevpeyvîn
Mem Xelîkan

68 Helbest
Seyfî Doğan

69 Şîrîn Omaro
Berhevkar: **Şerwan K.**

70 Sedema belavbûna eşîrên kurdan
Amed Tîgrîs

72 Mustafa Kizilkaya
Edîtor

www.arsivakurdi.org

Ji bîrnebûnê

Di vê hejmarê de jî wek hejmarên me yên din nivîsên balkêş hem ji aliyê emekdarên kovarê yên wek, Nuh Ateş, Mem Xelîkan, Muzaffer Özgür, Seyfî Dogan û hem jî ji pênûsên nu yên wek Memduh Selîm, Ecevît Yildirim, Hesen Huseyîn Denîz, Mistoyê Heco, Hizir Akbîna û Mehtab Îdelî û ji xort û keçên ciwan ve hatiye dagirkirin.

Birêza Mehtab Îdelî bi sernivîsa *Rêwîtiya hêvîyê* serpêhatiyeka xwe ya gera Mêrdînê nivisîye. Rêwîtiyeka bi hêvîya dîtina bajarekî dîrokî yê kevn û lêgerîneka li koka xwe gerîn e. Mehtap rêwîtiya xwe weng bi nav dike: *Ew hêvî, hêviyeke wiha bû ku, ji doh re umêd, ji îro re ronahî, ji sibê re ro.*

Birêz Hizir Akbîna bi sernivîsa *Hosteyê hostan* hosteyekî çêkirina xanîyan bi nasandina hunera xanîçêkirina wî bi me dide naskirin û bi vê ra jî rehmetîyê Qere Hecî bi bîr tîne. Jîyana Qere Hecî, ji çend alîyan ve balkêşîyeka xwe ya taybet heye. Gotineka mezinên me heye, dibê; *meriv ji bavê de sêwî namîne, lê ji dê de sêwî dimîne.* Ev heta cîyekî rast e, eger dayîkeka xort û piştgirên wê yên malbatê hebin zarok bê xwadî namînin. Di nav çanda civata me de xwedîlihev derketin heye. Qere Hecî hê du salî ye, bavê wî dimire, apê wî xwedî lê derdikeve û heta 11 salîyê jê ra bavlixîyê dike. Ew di zaroktiya xwe de li ba hosteyên xaniyan dest bi kar dike û zîrektîya xwe bi kar tîne û dibe hosteyekî bi navûdeng li herêma Anatoliyê.

Tiştekî din î balkêş di vê nivîsa birêz Hizir Akbîna de heye ku li navça Anatoliyê, çêkirina avahîyan heta wê demê piranîya xanîyan ji kerpîça dihatin çêkirin. Ev dema hostatîya Qere Hecî dema destpêka çêkirina xaniyan ji kevirên taybet e. Nivîs bi çend numûneyên wêneyên avahîyên ji hunera Qere Hecî ve hatiye xemilandin.

Di destpêka bihara navîn de civîna hevkarên *Bîrnebûnê* li bajarê Almanyayê, li Frankfurtê çêbû. Birêz Seyfî Doğan ev civîn bi helbestkî daye nasîn.

Ecevit Yildirim kurteçîroka bi navê *Reşo*, balkişandîye ser mijareka ku herdem aktuel e, li ba piranîya malbatên kurd, hem li welêt û hem jî li derveyê welêt. Reşo zarokekî ji malbateka ji kurdên Anatoliyayê ye ku li Almanyayê mezin dibe, diçe dibistanê û bi kesayetiya xwe dihese, li du pirsên xwenasînê ye. Dîyalogên Reşo bi dê û bavê wî re ji gelek alîyan ve mîjarên lêkolînên sosyolojîk ên perwerdeyê ne. Birêz Ecevit Yildirim wek her car, bi zarekî xweş û dîyalogên kurt ev mijar pir vekirî nivisîye.

www.arsivakurdi.org

Henek û yaranî parçeyek ji çanda me ye. Pêkenîn an pêkenok ji bo şahî û dilovanîyê tên kirin. Lê divê ev ne li ser biçûkirina kesan an gruban bin. Birêz Hizir Akbîna di nav kurdên Anatoliyê de bi nimuneyeka pêkenokekê bi sernivîsa *Pêkenok* li ser vê mijarê nivisîye.

Li welatê min bihar tê, sernivîsa nivîsa birêz Hesen Huseyîn Denîz e. Xweşbûn û ciwanîya biharê li Kurdîstanê bi zimanekî şîrîn nivisîye. Bi hatina biharê re hem êş hem jî şahîyên welêt bi van gotina li ber dilê me rêz dike; ... *di demên pir berê de li welatê min jî zarok rû-liken ji dayik dibûn. Dayikan bi stranên evîniyê dergûşên pitikên xwe dihejandin. Dapîran teşî dirist, bêrîvanan şîr dikeyand, koçeran li ser kaniyên zozanan tûzika dermanê dilan berhev dikirin. Keç û xortên ciwan ji sosin û beybûnan tacên rengîn dihûnan û didan serê xwe...*

Xizan Şîlan bi helbesta *Neynika qederê* rastîyeka civata kurdan a xerîbîyê kiriye mijara helbesta xwe.

Mistoyê Heco ji folklora me *Çîroka mişkên kor* nivisîye.

Memduh Selîm li ser navên taybet ên meriyan li nav kurdên Anotoliyayê bi sernivîsa *Navên merivan ên taybet* nivisîye û van navana bi yên kurdên Çîyayê Kurmênc nemaze yên devera Efrînê dide ber hev û nêzikbûn û wekhevbûna wan tîne ziman. Wek nimûne çend nav ji gundê Bulduq berhev kiriye. Ev nav û dengkirina kurdên Efrînê jî nîşan didin ku kurdên Anatoliyê û yên Efrîne merlixêya wan bi hev re heye.

Bi navê *Sê kes û sê kilam,* Muzaffer Özgür kilamên ku li ser egîta hatine gotin amade kiriye.

Birêz Nuh Ateş dîsan li ser beşeka çanda civata me ku li ber wendabûyînê ye xebateka giranbuha kiriye û bi navê *Pezname, kultura pez bixwedîkirinê û berên wê li ba kurdên Anatoliyayê yên ku bi kurmancî deng dikin* berfireh lêkolîye.

Birêz Xelîl Birinî li ser *Cinavka pirsên **kî, kê*** derseka kurmancî nivisîye. Mala wî ava, wexta xwe daye xebateka weng.

Lêkolîna birêz Dr. Sozdar Mîdî ya ji xeleka gotarên wî ya bi navê *kurd û îslama siyasî,* bi sernivîsa *Bermekîyên kurd di kûranîya dîrokê de* beşa 5:an bi wergera Mustefa Reşîd berdewam e.

Bi Hecoyê Rîştî ve hevpeyvîn li ser kurdên Hêlkecikê yên Aksarayê Mem Xelîkan bi çend wêneyên jinên wir bi hevpeyvînekê bi me dide nasîn.

Ji zargotina me *Şîrîn Omero* ji alîyê Şerwan K. ve hatiye berhevkirin.

Birêz Amed Tîgrîs di derheqê eşîra bermekîyan de lêkolînek kiriye û bi navê *Eşîr, bav û kalên me, Bermekî* wek kîtêb di nav weşanên Apecê de hat weşandin. Me ji kitêbê beşek ji ber aktualiya nivîsê bi navê *Sedema belavbûna eşîrên kurdan* di vê hejmarê de belav kir.

Heta hejmara bê bimînin di xêr û xweşîyê de

Ali Çîftçi

www.arsivakurdi.org

RÊWÎTIYA HÊVIYÊ

Mehtab Îdelî

Havîna borî ez û hevala min, em çûn bajarê Mêrdînê. Ew çûyîn ji bo hêviyekê bû. Ew hêvî, hêviyeke wiha bû ku, ji doh re umêd, ji îro re ronahî, ji sibê re ro. Ev lêgerineke li kokê xwe gerîn bû. Jikuderêbûna zaroktiya me bû, zaroktiya me ya bi çar aliyan ve reh berdayî.

Me bihîstibû ku li unîversîteya Artukliyê nîviskarekî ku bersivê me bide heye.

Me dixwest, ku em him ji bo pirsên xwe wî niviskarî û him jî Mêrdînê bibînin. Em bi balafirê çûn Mêrdînê. Ji Balafirgehê em çûn Artukliyê, çend saetan li otelê man. Paşê, bi wî niviskarî ve li bajarê kevn me hevdû dît.

Em bi naskirina wî, bi sohbeta wî, bi alîkarîya wî ya ji bo lêkolînên me pir kêfxweş bûn.

Dema min got; em di vê mijarê de nû ne, wî cesaret da me û got; "Destpêkê ez jî wek we bûm lê bi demê ra ez gêştim vê merhelê. Zanetîyê re wext û kar lazim e. Hûn jî dikarin wiha bikin. Ew gotin rast bû, piştî wê rojê ez dibêjim, ku mirov bixwaze dikare her tiştekî bike. Di sohbetê de me got; "Em dixwazin bi vê lêkolînê; em ji ku hatine, çima, çawa û kêngî hatine hîn bibin."

Dema kurdên Anatoliya Navîn dibêjin; "Em ji ku de hatin? Kêngî hatin? Dixwazin bizanin." Pir kes dibêjin, "Hûn ê çi bikin, ger hûn bizanin wê çi bibe?" û qerfên xwe dikin. Kes derdê me fêhm nake. Wî got, "Ev tiştekî normal e" û behsa lêkolînên xwe kir. "Dema ez zarok bûm bavê min carekê gotibû em ji Xorasanê hatin û ew di bîra min de ma, min mereq kir, berî bîst salan min dest bi lêkolîna xwe ya ji bo Kurdên Xorasanê kir. Îsal xelas bû û çap dibê." Pişt re, ji bo lêkolînên me navên çend çavkanîyan da û got, "Bi pey xwestina xwe kevin, rojeke hûn ê jî bersivên xwe bibînin. Bila kesek manî daxwaza we nebe. Ji bîr nekin, hêvî me her dem heye."

Dû vê sohbeta xweş, me xwest em bajarê kevn bibinîn. Wî alîkariya me kir û em çûn nav bajêr. Bajar wek xewnekê bû. Xewneke

www.arsivakurdi.org

heftreng û şêrîn, xewneke bi hesreta sedsalan, xewneke ku dîroka di dilê me da em kirine aware û beriya mezopotamya di nav de bûye. Beriya wek deryayekê kesk î bê pêl, li ber te vedizile. Û te dike nav xeyalên meşa pêxwas, çûna ber bi diroka xwe ve. An jî wek kevoka li ser xanî temaşekirina bi xemgîniya ji dûr ve bû. Kolanên kevn ên di telaşa jiyana modern de. Telaşa wiha ku, kî bûn û pirçandîbûna wan jibîrkirin dane. Bajar; bi avahiyên xwe yên dîrokî li ser girekî ava bûbû. Bajar êvarê wek ezmanê, ku bi hazaran stêrkan xemilandîye û mîna baxçeyekî ji teysokê hatiye civandin xuya dikir. Te dixwest heta sibê lê seyr bikî. Weng delal, weng xweşik bû.

Em hilkişayabûn cihekî bilind, ew bajarê kevin bû. Me siftê li derdora bajêr mêze kir. Em li bazara kevn geriyan. Dûra em çûn qonaxa kevn. Servîs û mêvanperweriya wan gelekî baş bû û muzîka zindî jî hebû. Stranbêj bi kurdî pir baş distira. Em çend saetan li konaxê runiştin, paşê vegeriyan otelê. Sibê li cihê Artukluyê geriyan. Me xwestibû em bi otobûsê vegerin, ku hindik be jî bajarên din ê welêt bibînin. Me bilêtên xwe standin û nîvro em çûn termînala otobusan. Me baholên xwe dan arîkar. Di bahola min de pirtûkên nivîskar, ên dîyarî min kirin, hebûn. Wî ji bo ku careke din mil û baskên Ehmedê Xanî neşikînin, ew bi me re dişand surgunê. Mem û Zîn ji Bekoyî direvand û yên din jî jubila xwe ya wî welatê lê dilşikeştî bû.

Rêwîtiya me êdî dest pê kiribû, rêwîtiyeke bi heyecan, bi hêvî, bi matmayîn, bi xemgînî û dirêj.

Ew rêwîtiya hêvîya Ûmûd, sê bira û xwişk û dayika wan bû. Ew li qoltixe (paldanka) pêşiya me runiştibûn. Dayika wan 20-25 salî hebû tinebû. Zarokê herî mezin heft, yê herî biçûk yek salî bû. Şeş kes li du paldankan runiştibûn. Li ser hev, bê rehetî, bê xwarin û bê vexwarin. Weng sêfîl, weng xerîb, weng xemgîn. Min ji dayika wan pirs kir: "Bavê wan li ku derê ye, tu çima bi tenê yî, xwezke ev jî bihata alîkarîya te bikira". Wê got;" Mêrê min hat hepiskirin. Em bê kes mane û em terin mala bavê xwe, Stenbolê. Ez û hevala min em mat man, me tiştek negot. Û deqîqên bêdengî dest pê kir. Hîseke weng e, ku tu nikari ji xwe re jî bibêjî. Hîseke wek agir dilê te dişewitîne. Sirf me dizanî ku otobûs diçû, em

www.arsivakurdi.org

jî di hundirê wê de bûn. Lê bi ku ve û çima, me êdî nizanîbû.

Dayika wan di paldankekê de runiştibû, lawikê biçûk di hembêzê de bû, sê xwişk û bira tev di paldankekê de û Ûmûd cihê xwe tinebû, li korîdora otobûsê li ser pê bû. Me xwarina ku ji bo xwe kirîbû, li zarokan belav kir, ew gelekî şa bûn. Ew hêdî hêdî nêzî me dibûn. Me got, "Ûmûd were li hembêza ma rûne". Ew ji bo wî bû firsendek û bi lez hat, di navbera me de rûnişt. Êdî sihbeta me dest pê kir. Xwişk û birayê wî jî bi meraq li paş xwe mêze dikirin û tev li sohbetê dibûn. Gava min bi henekî digot; "Ûmûd tê bi kurê min bî?" Li her carekê digot, "Haha". Xwişka wî ya xweşik (Ew çar bira û xwişkek bûn) di navbera her du paldankan re li çavên min mêze dikir. Dema min got; "Tu jî dixwazî werî hembêza min?" Serê xwe hejand û bi lez xwe kir navbera her du paldankan, nikarîbû derketa. Min got; "Ji pêşî de were," Bi lez meşiya û hat li hembêza min runişt. Li Otobûsê bêdengî hebû, me paşê ferq kir ku her kesî guhdarî me dikir. Em kî bûn û me çi dikir? Xaltîka ji Wêranşehrê li otobûsê siwar bûye bi meraqa xwe nikarî û pirsî; "Hûn jî kurd in û ji ku derê ne?" Ji bo pirsa siftê me got, "Erê em jî kurd in." Lê pirsa duyê me bi hevala xwe ve li çavên hev mêze kir, em ji ku derê bûn? Em ê ji xaltîka xwe re çi bibêjin? Em ê çawa bibêjin! "Em jî li vê bersivê, diyar bi diyar wek evdalan digerin". Me bêçare got; "Enqere." Û pirsa herdem dîsa hat: "Li Enqerê kurd hene?" "Hene xaltîk." Xaltîk tevlihev bû û berê xwe veguherî. Vê gavê Ûmûd û xwişka wî çûbûn ba dayika xwe û raketibûn. Xwişk li bin paldanka dayikê, Ûmûd li korîdora otobûsê. Şofor anons kir û navber da. Çend kes di ser Ûmûd re derbaz bûn û çûn der ve. Em mat man. Navber xelas bû em vegeriyan. Ûmûd hîn li wir bû. Hevala min, ew girt hembêza xwe. Bi dengê qerebelixê keçik jî ji xew rabû. Min got, "Were", bi lez hat hambêza min û piştî çend deqîqeyan dîsa raket. Dîsa di otobûsê de bêdengî dest pê kiribû. Min di pencerê re hesreta me ya bi sedsalan, hesreta bi pêşvêçûnê otobûsê dîsa nêzîk dibû seyr dikir. Menzere wek bi motîfan neqîşandibûn, weke motîfên geltê mezinên me neqişkirî.

Weng manîdar, weng xweşik. Li ser gir, livandinên firfirokan, ji dûr

ve di nav çend kilometreyan de ew ala esareta xwe daye ser xaka Mezopotamya ya bi zimanê wê nizane .Yaşar Kemalê li ber çemê Firata xwîn diherikî ye. Mûsa Anterê bi nûrê xemilandî ye. Û kî dizane hîn çiqas ên din. Qêrîneke wiha ye, ku an li paytextê gewr ê tu ne jê yî, qet û qet çênebûn bû, an jî vegera berûpaş a wê surguna dev û lêvên te ziwa dike bû. Bi livandina keçikê ez bi xwe hisiyam, her kes raketibû. Ez, şofor û alîkarê wî hişyar bûn. Em ji welêt bi dûr ve diçûn, êdî nêzîkî Enqereyê dibûn. Xaltîk jî xew rabû. Em di rêya gundên me re derbas dibûn. Me bi xaltiyê nimand. Me got: 'Ev gundên me ne. Gundên me yên bi sedsalan kurd bûn, çand û azadiya me di navê de veşartî, gundên me ji me re him gund him welat bûn." Wê êdî bawer kir, ku li Enqerê jî kurd hene. Piştî seatekê em li Enqerê bûn. Wext hatibû, otobûs sekinî, me, Ûmûd û xwişka wî êdî li ser paldankan dirêj kir û teslîmî dayika wan kir. Û em ji otobûsê daketin, me baholên xwe girtin. Rêwîtîya hêviyê êdî xelas bibû.

Lê, me nikarî em biçin, hişê me li ser zarokan ma. Ewê çi bibin? Ew bi xilmaşbûnên dilsozî yên di hembêza me de hatibûn ragirtin. Li jiyana di xewnên xwe de, li serhildanên biçûk û bi birçimayînê. Ew rastiya jiyana, piranîya zarokên kurdan bûn. Em wan qet ji bîr nakin!

AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliyayê wêneyekî kevn di ***Bîrnebûn***ê de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliyayê bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliyê didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin–mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlemediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

www.arsivakurdi.org

HOSTEYÊ HOSTAN

Hizir Akbîna



Qere Hecî li ser kar

Ew endezyarekî bê destûrname (dîploma) bû. Avakirina xanî çekirinê ji bo wî ne zahmet bû. Plan û proje her dem di serî wî da amede bûn. Xwendin û nivisandina wî tûne bû. Lê, hesabê wî gelekî baş bû. Wî dizanî ku çiqes malzeme (ambûr, hacet) pêvîst in, her tişt di serê xwe da amade dikir û pêk tîna. Ew cotkarekî gelek baş bû. Ji wî re Qere Hecî (Ali Güçlü) dihate gotin anjî Hecîyê reş.

Ew nehat jibirkirin û hîn jî nayê jibirkirin. Ew afrinerekî mezin bû. Ji ber ku tişten wî avakirine (xanî, fêrgeh (mektep û mizgeft) hîn li ser pîyan in Dema mirov avahîyên wî dibîne, ew bi mirovan re dikenin.

Jîyana wî

Hostayê me di sala 1339an (rastbûna xwe ne zelal e -1920) de li gundê Kirkpinarê-Celikan(giredayî navçeya Kulu-Konyayê) ji dayik bûye. Navê bavê wî Îbrahîm navê dayika wî jî Zelîha ye. Dema ew du sali bû bavê wî çû ser dilowanîya xwe. Dema bavê wî mir, apê xwe Omer ew kir bin baskên xwe û hata 11 salîyê li cem apê xwe ma. Dema

www.arsivakurd.org

jê dihat pirsîn ka ew çawa bû hoste, hosteyê wî kî bû, kê ew ferî hostetîyê kiribû? wî digot;

– Dema ez emele bûm min tiştek ne dizanî, min ji Hesî Mûsê dipirsî û wî jî ji min re eşkere dikir, bersiva min dida.

Gor nerîna me hunera wî ji dayikbûna de hebû. Ew wek hoste (afriner) ji dayik bûbû. Di rihê wî da hostetî hebû. Ew hin 11-12 salî bû dest bi hostetîya karên mezin kiribû. Destpekê de harim çêdikirin û gelek tecrûbe ji harim çêkirinê girtin. Dema ew 15-16 salî bû edî tiştên herî mezin çêdikirin. Kadîn, gom, aşxane û xanî avakirin karê wî bûn. Demekê şûnda dixwest malekê ji xwe ra jî çêke. Mala wî ji xwelîyê bû. Dema mala xwe çêkir heval û cîrana dîtin ku bi rastî ew edî hosteyekî baş e. Edi her kesî dixwast mala xwe bi Hecî bide çêkirin. Qere Hecî 17-18 salî bû edî ji xwe baver û jêhatî bû. Berdar (*Üretken*) bû gelek kesan dixwastin keçikên xwe bidin Qere Hecî.

Zewaca Qere Hecî ya bi dayîka Şerîfe re

Dema wî ya zawacê hatibû. Dile xwe ketibû dayika Şerîfe! Şerîfe keçika axayê gund bû. Ji wî re digotin, Omî Qere Millo. Tirsa wi ya herî mezin ji ber ku sewîyê, keçika nedin wî. Gelek kes an Şerîfe dixwestin. Qere Hecî ditirsîya ku Şerîfê nedin wî. Digot; "ya baştir malbata min kê ji min re minasib bibînê, ezê bi we ra bizewicim. Rokê gundîyêkî ji Omî Qere Millo dipirse.

-Qere Hecî keçika te bixwaza te bidî? Omî Qere Millo nav û dengên Qere Hecî bihisti bû û dibê;

- Eger xwedê kiribe qeder, çima nedim.

-Tu axa yî û dewlemendî te çawa keçika xwe bidi wî xizanî? Ew nikare qelingê keçika te bide! Omî Qere Millo bersiveka baş dide gundîyê xwe.

– Kesên jêhati re xizantî ne pirsgirêk e. Eger ji bo xizantîyê nexwazin, min da çû!

Malbata Qere Hecî dibihize û şa dibin û wê evarê diçin xwazginîya Şerîfê û wan dergistî dikin. Haziriya daweta xwe dikin û dizewicin.

Piştî çend mehan şûnda Qere Hecî û birayê wî bange eskerîyê dikin. Qere Hecî hîn 17 salî, birayê xwe jî 20 salî bû, çûyina herdu bira bi gelek kesan giran dihat ji wan yek ji Êma Hemê bû. Şareya mezin û dengbêjeka jinan bû. Li ser her du bira ew stran gotibû.

www.arsivakurdi.org



Mala Mehmedî süsli (Celika-Kirkpinar)

Dile min Hesik, Heci yê
Her du bira bi hev ra kirin topçîyê
Gundo va çi heybet e
Hîn î nizanê bi tirkîyê

Yaziciyek hatiyê ji vê dewletê
Yazmîşdikê eyaletê
Sêwîyê Zexê min herdu avêtine xetê
Anik qûrban Qere Hecî nizane bi tirkîyê

Ji askerê hat bi şûnda hostetîya wî hîn zêde bû, gelek xwedî tecrûbe bû. Edî dixwest karên herî mezin çêbike. Yekemîn mala cîranê xwe mala Süslü û piştra jî mala Meçkî Şarê çêkir.

Di sala1940 de Mizgefta gundî Celikan-Kirkpinarê çêkir. Nav û dengên wi gelek gundan bihîstin. Edî walabûn ji wî ra tûne bû. Ji gundên derûdor jê ra peşnîyar dihatin. Edî dema wî ji bo cotkarîyê nema bû. Nedikanî cotkarîyê bike. Ji bo karê cotkarîyê kesek girtibû, karê wî êdi tene avadanî bû.

Karê wî yê herî mezin yê bi amadekirin û pêşnûma (proje) li gundê Celikan-Kirkpinarê avakirina dibistanê bû. Dewletê di sala 1949an de li gundê Kirkpinarê biryara mektep çêkirinê derxist. Ev tiştekî resmî bû. Dewletê cîh û projeya mektebê û hemû pevîstî eşkere kirin û proje dan Qere Hecî. Wî ji dil û can qabûl kir, Fevzî û Hüseyîn Yildiz, Halîl Taşdelen ve dest bi kar kirin.

Destpêkê de proje xist destên xwe û lê nihêrî, xwendin û nivisandina wi tune bû. Lê disa jî ji proje baş fehmkir û dest bi çêkirina mektebe kir. Ji kesekî xwendayî baştir bêkemasî bingeh ava kir. Piştî bingeha mektebe xilasbû endezyer

www.arsivakurdi.org

(muhendis) hat gund û avahîya mektebe kontrol kir. Endezyar li avahîyê nihêrî û got;

– Qere Hecî bêkemasî çêkirîye. Endezyar Qere Heci û hevalên wî piroz dike.

Dema min nivisa xwe amade dikir ji hevalekî xwe yê endezyar (ji încowê birêz Osman Kara) pirs kir;

– Kesekî xwendin û nivisa xwe tûne be çawa dikare ew projeyan pek bina? Bi rastî mirov dikara proje çêbike? Hevalê min bersiva min da;

– Kesên bi feraset (zeki) dikarin çêbikin. Ji ber ku zimane mîmarîye xet in (çizgî), gelek kesên bêxwendin û nivisandin ew tiştana pek tînin. Mînak; Stranbêj İbrahim Tatlises jî bêxwendin û bênivisandin bû û wî jî karê avadanîyê yê hesin rexistinê dikir. Tenê li projê dinerî û gor we hesin dibirî, ew jî hesinkar bû.

Avakirina mektebê berdevam dibe. Qere Hecî û hevalên xwe bi dilûcan karê xwe dikin. Qaymeqam te kontrolê û lê dinerê û dibêje;

– Hecî ew mozaîk ne saxlam in, ê bixelin!

– Na Qaymeqam beg! 50 sal jî here dîsa naxelin. Eger bixelin ez dîsa li vir im, çêdikim, hûne bibinin.

Niha sal 2018 in û hin jî ew mektep 69 sal in li ser pîya ye. Di we fêrgehe de bi hezaran xwendevana xwandina xwe xelas kirin, xwedî kar û karbend bûn.

Rojekê Qere Hecî ji gundekî Cîhanbeylîyê projeyek xanîya girtibû. Endezyar, proje dîna ber Qere Hecî. Ew pir bi kelecan bû. Nedinazî ku çi bike. Qere Hecî ji wî ra got; Tu li şûna xwe rûne, ez vê projeya te çêbikim. Xwast ku li ser projê bi endezyar re biaxive lê wî jî wek pir kesan bi tirkî deng kirin baş nedizanî. Ji bo li ser projê deng bike kelîmeyên teknîkê qet nedizanîn. Qere Hecî li ser axê, bi heben kirpîtê proje nexş kir. Endezyar lê mêze dikir pê bawer bû û derket çû Enqerê. Çend rojan bişûnda endezyar hat û dît ku Qere Hecî projeya wî rind çêkirîyê û pir kefxweş bû.

Xanîye Qereqol

Qere Hecî roj bi roj, sal bi sal pêşve diçû. Him ji alîyê hostatîyê da him jî ji alîyê aborîyê da rewşa wî gelek baş bû. Edî dixwest ji bo xwe jî xanîyekî herî baş çêke. Kevirên baş û giran ji ocaxê keviran ji xwe ra anîn. Bi gotina wî her kevirek nezikî 2 tona bûn. Qere Hecî pêşaroj baş

www.arsivakurdi.org



Mala Eso(Tunç)

didît. Gorê hezkirin û dilê xwe di hûndirî salekê da xanîyek ji xwe re çêkir. Dem hat edî dixwest barê mala xwe ke.

Xeberek ji gund re hat, hat gotin ku qereqol dayîne gund. Hinekan dixwest qereqol hebe hinekan jî nedixwest. Her kesî şorek dikir. Hinekan digot;

– Ji bo pirsên resmî ku va herin, li gundê me jî gereg e.

– Qereqol tiştekî baş e,

– Bila li gundê me jî qereqol hebe.

Biryar hat sandin û qereqol hat qebûlkirin. Heyetek hat gund û ji bo qereqol şûnê (cih) amade bikin. Dema cîh digerin mala Qere Hecî dibînin û dibêjin ew mala geleki baş e ji bo qereqol. Diçin



Plana mala Qere Hecî ya ji bo xwe çekirî (Xaniyê Qereqol)

www.arsivakurd.org

cem Qere Hecî û ji wî diprisin, "*Em mala te ji bo qereqol dixwezin!*" Qere Hecî hîn di mala xwe de bi dilê xwe rûnenişti bû û mêvan û dost xêrhatî nekiribûn, xizanî tene, rojekê di mala xwe da raneketibû.

Xanîyê xwe teslimî dewletê kir. Hefteyek şûnda 10 leşker (jenderme) hatin û di mala Qere Hecî de xwe bi cîhkirin. Mala wî edî bûbû qaraqol. Ode kirin xewxane (qawîş) û buro, xanîyê qatix-aşxanê jî kirin nezeretxane. 11 sala qereqol di vir de karê xwe meşand. Qurişek pere jî ji dewletê nestandin. Piştî 11 salan dewletê qereqol betal kir. Qere Hecî ket xanîyê xwe. Çend salan bi şûnda jî xanî hat xelandin. Heta we rojê jî gundîya ji mala Qere Hecî re digotin qereqol. Rojekê hevalekî lavê Qere Hecî, Cewo tê mala wan û ji birayê wî yê biçûk dipirse;

– Cewo li ku ye? Birayê xwe dibêje;

– Di nezeretxane de raketiyê. Hevalê xwe dibêje;

– Na looo! kîngê ket nezeretxane?

– Evarê ketê. Hevala xwe tengê ditirse û çex be here, Cewo derdikeve û dibeje, Lo! ezî va me!

Her dem peşniyar ji Qere Hecî re dihatin. Cimata Kuluyê di sala 1954 de dixwastin li Yenî Mehellê mizgeftekê çêkin. Ji Qere Hecî pirsîn, got; erê lê ez dixwazim kevirên xwe bixwe bînim. Hat qabûl kirin. Piştra jî peşnîyara çêkirina Yeşil Camîyê (mizgefta kesk) hat, Hecî ew jî qebûl kir. Dema havînê ji wî re sekinandin tûnebû. Rojên wi wala derbas nedibûn.

Li ser mizgefta Qozanliyê (Kozanlı Merkez Camii) gotinên Ali Karpuz;

– Mizgefta me Qere Hecî û Halil Taşdelen bi hev ra çêkirin. Xwedê ji wan razibe bêkemasî û bêhile çêkirin. Piştî 20 salan şûnda ji Hecî dipirsin.

– Hecî pevîst e em hînek beton bavêjin ser mizgeftê barî xwe yê giran be an na?

Qere Hecî dibêje;

– Ew hin tiştên giran jî dikare li xwe ne, ew saxlam e hûn dikarin zêde jî lêbikin.

Destpêka salên 1970î de edî Qere Hecî dev ji ocaxê keviran berda, ji ber ku kevirên Nevşehirê di xanî avadayînê de dihatin bikar anîn. Ew kevira ji bo wî hîn rehet bû, hîn baş form didayê, hîn jî ji kevirên din siviktir bû. Qere Hecî

www.arsivakurdi.org



Mizgefta kesk (Kulu)

kesekî bi disîplîn û xûdan prensîb bû. Qedr û qîmeta însana dizanî. Ji bo karê xwe jî serkeftî bû. Di bin destê wî de hacetên xwe her dem hebûn. Ji bo hacetên xwe biparêze hevalê xwe agahdar dikirin. Dema destpêka kar da hacetên xwe kontrol dikirin mûrç, qelem, şêyê kevira, metro, terazîya avê, çirpî, şakûl, mala, çakûç, kuling, balyoz, tevr, bêr, bêl. Dema hacet rast bûn, kêf dida.

Ji aliyê avadanîyê de berê çîmento tûnebû an jî bûha bû. Bi keviran xanî çêkirinê de herî (çamûr) çêdikirin. Qere Hecî dema herîyê amadebike ax, ka, qûm, kils bi avê tevhev dikir. Wek mîna çîmento saxlem dibû.

Carcaran kevirên taybet gereg



Xaniyê Heskî Ereb-Hasan Pekmez-li gundê (Celika) Qere Hecî bi kevirên ji aliyê Nevşehirê anîn çêkirî

www.arsivakurdi.org

bû ji bo ser derî û penceran, ev kevr bi şikleka taybetî çêdikirin. Ji bo geregbûna kevirên dirêj bixwe diçû ji ocaxê kevira ew amade dikirin. Di avakirina avahîyê de ji bo rêza ser pencere û derîya kevirekî dûz û bi dirêjîyê, carcaran jî bi teknîka şidandinê modela xwe amade dikir. Di mizgefta de jî pencere gilover çêdikirin. Bi van plankirinê ji alîyê derda avadanî xwaş xûya dikir.

Çend gotin li ser jiyana wi ya taybet

Karê Qere Hecî zedetir li havîna bû. Zivistanê karê xani çekirinê qet tûnebû. Wek hobî zivistanê diçû nêçîrê. Ji neçîrvanîyê gelekî hez dikir û neçîrvanekî baş bû. Rojekê li neçîrê agirê wî tunebûyê ku cixara xwe pê vêxe. Ji şivanakî ar dixwaze û heta evarê ji bo ku vê agir nemîne qet agirê cixara xwe sar nake (tiryakîyê levan bû). Ji çayê gelek hezdikir. Di rojekê de 2-3 caran ji jina xwe demkirina çayê daxwaz dikir û pê re cixare jî dikişand. Mevanhez bû. Kesên ji bo deweta dihatin gund, diçûn mala Qere Hecî.

Ew gelekî dixebitî. Geleki jehatibû û bi hêz bû. Rojekê karkerê li ber desta dixweza kevirekî bide ser îskelê lê kevir pê giran te nikare bide ser. Qere Hecî dibîne û kêvir hembêz dike û dide ser îskele.

Rojekê dema alîkarê xwe kevira yonî dikin li nav wan tere-tê. Yek ji wan jî Mehmet hoste bû. Ji welatê kal-pîrê xwe ji İslahîya-Entabê anîbû li ba xwe kar didayê. Kesekî zîrek bû. Carcaran ji cimaatê re kilamê welatî jêr yê destana digotin. Hecî bi karê Mehmet gelek memnûn bû. Mehmet zivistanê vedigerî diçû İslahîyê. Qere Hecî dibejê;

– Mehmet, te kevirê di destê xwe de xwar çêkiriyê, kevirê tu li ser kar dikî çap e. Hostê li kevirê ber xwe meze dike û dibêje;

– Na! Kevirê min ne xwar e. Dema te kevir da ser dîwarê xwe û kevirê min çap derket ez yoma xwe ji te nastînim. Radibin kêvir didin ser dîwar Mehmet hoste bixwe jî fahm dike ku kevir xwar bûyê. Qere Hecî li çavên wî meze dike û dibêje;

– Hoste metirse ez riziqê zarokên te naxwazim…

Mizgeft, dibistan û xanîyên wî çêkirî navê wî didin jiyandin. Bi gotina wî, qesî 20 mizgeft (camii), dibistan û nezî 600 jî xanî di nav gundên Anatolîya Navîn de çêkirîne.

www.arsivakurdi.org



Xaniyê Mevlüt Sarıbayır -li gundê Celika-Kirkpinarê







Çend berhemên wî yên taybet jî ev in:

1- Mizgefta Kirkpinar (Celikan),
2-Dibistana Kirkpinar (Celikan),
3- Mizgefta Damlacixê,
4- Mizgefta Kesk (Kulu yesil cami),
5-Mizgefta Serçesarayê,
6-Kozanli mizgefta merkezê,
7- Mizgefta nû (Kulu yeni cami),
8- Mizgefta Gundê Bulduk,
9- Mizgefta gundê Şavliya,
10-Mizgefta gundê Mihîna (Yaziçayir),
11-Li gundê Celebê konaxa Sami Celepli,
12-Dibistana gundê Kelhesen,
13- Mizgefta gundê Balçikhesarê.
14- Mizgefta Celikan(Yeşilyurt) ya kevn.

Xwedê rehma xwe pê de. Mirov dimirin, nav û dengên wan dimên.

Tebenî: Ji gundê me birêz Halil Doğan ji bo ez nivisa xwe amede bikim agahdarî dan min, li vir spasiya wî dikim.

www.arsivakurdi.org

Civîna Bîrnebûnê li Frankfurtê

Seyfî Doğan

dîsa dîsa gelî kurdan dîsa
li Frankfurta Goethe li şeş û heştî avrêlê du hezar hejdeh
nefsbiçûkên bîrnebûnê
hatin ba hevdu dîsa
kûrûkûr kolan
hûrûhûr herandin
bîst sal in ku bûyê adet
bi zar û zimanekî xweş
hevdu pasnandin
û ji hevdu re bûn pişтbaz
tabiî ala kêmasîyan û rexnan jî vekirin
bi zimanekî hilberîn
dan ber bayî germ û aram
mala rêhevalên elmanya ye ava be
qadr û qîmete yên ku ji swêd hatî pir baş zanîn
her yêk ji wanan re bû yek mîhmandar
destên wanan şil û zîwa nekirin





www.kurdiyakurdi.org

REŞO

- I -

Ecevit Yildirim

Meha adarê, devê biharê bû. Tîrêjên rojê xweza û dinya ronî dikirin. Tîna rojê hêdî hêdî dinya germ dikir. Çûçikên ewra ji cihên xwe yên zivistanî vegeriyabûn. Bi hemû ahenga xwe li ezman form û motîfên yek ji yê din xweşiktir xêz dikirin.

Wê salê zivistaneke pir dirêj hebû. Serma û seqem bû. Berf jî pir barî bû.

Berfa zivistanê xwe bi eynat li erdê nûskandibû.

Hêza tîn û tîrêjên rojê têr nedikirin ku berfa zivistanê di heman demê de bihele. Reşo jî bi çar çava li benda helandina berfê bû.

Ku qada futbolê ji berfê xelas bibe û ew ê (jî tev) bi hevalên xwe va mîna salên berê dîsa bi futbolê bilîzin.

Reşo xortekî çardeh-panzdeh salî bû. Telakî tenê yê mala bavê xwe bû. Bavê Reşo bi salan berê ji gund hatibû Almanya û lê bi şûn bûbû.

Armanca bavê Reşo berhevkirina heqê dolmîşekê bû. Dil hebû pê di nav gund û navçeyê de seferan bike. Pê debara mala xwe bike.

Gava heqê dolmîşê berhev kir, teneke din jî ji heval û dostên xwe deyn kir û şûna dolmîşê qamyonek stand.

Almanya li bavê Reşo hatibû.

Şûna ku bi xwe vegere gundê xwe, jina xwe û lawkê xwe anî Almanya.

Bavê Reşo nedixwest malbata wî careke din xizaniya gund bibîne.

Derfetên Almanya jê re pir cazib bûn.

Li gor bavê Reşo, diviyabû ew perwerdeyeke baş li Almanya bibîne û bibe xwedî pîşeyeke payabilind. Li gor zanebûna xwe bavê Reşo çi ji destê wî dihat dikir.

Li cem perwerdeya Almanî bavê Reşo ew dişande ber xoce jî. Diviyabû Reşo him dînê xwe bizane û him jî bibe xwedî

www.arsivakurdi.org

pîşeyeke payebilind. Reşo jî heqê wê dida.

Pir xortekî baqil bû. Li dibistanê her dem di nav xwendevanên serkeftî de bû.

Destê xwe davête çi karî, heqê wê dida. Gava armancek dida ber xwe, çi dikir û nedikir armanca xwe bi dest dixist.

Reşo ji hêla din ve xortekî pir bi meraq bû jî. Dema kurikbûna xwe de bi bavê xwe re rêwîtiyeke balafirê kiribû. Di balafirê de bavê xwe bi pirsan aciz û osan kiribû. Va balafira çing difire?

Va balafira çing li hewa dadiweste?

Li erdê çima her tişt piçûk xuya dike?

Balafir niha li ser kîjan dewletê ye? Va dewleta li jêr çiqas mezin e? Û hwd.

Bavê Reşo tim qal dikir; Digot Reşoyê me mîna meraqlî Melahatê ye.

Reşo sebra xwe nemabû. Dilê wî bi lîstina futbolê dixwest. Çû li qada futbolê li rewşa berfê mês kir. Qada futbolê hîn bi tevahî di bin berfê de spî dikir.

Reşo çû ji nav daristana li dor qada futbolê darekî mezin û qulotik peyda kir.

Pê li qada futbolê digerand û derbe li berfê dida. Cihên ku derbe dixwarin bi tîna rojê zûtir diheliyan. Reşo wê rokê hema bêje nîvê qada futbolê bi wê darê mezin derbe li berfê da.

Bi hêviya ku heta sibe cihên ku berfê derbe xwaribû zûtir bihelin çû malê.

Berêvar bû. Diya Reşo li malê bi hazirkirina xwarina êvarê ve mijûl bû.

Diya Reşo xwarinên li gund li Almanya jî dewam dikir. Ji zadî li ser nên bigre heta bi gaholê, ji nanbiriyê bigre heta sîremastê gî jî çêdikirin.

Diya Reşo wê rokê hevîr strabû. Gogên hêvîr gî li ser masê rêz kiribûn. Ji bo ku pê kilor û qatmeyên bi goşt, penêr û hêkan bike. Reşo hema li ber gogan rûnîşt dest û piyên xwe helmaştin û alikariya diya xwe kir. Diya Reşo gog vedikirin û wî jî hundir tije dikirin.

Di wî devê de jî bavê Reşo ji kar hate malê. Weke her dem li ber xwarinê rûniştin û bi kêf xwarina xwe xwarin. Piştî xwarinê Reşo çaya xwe girt û li ber televizyonê ningê xwe dirêj kirin û kêf da xwe.

www.arsivakurdi.org

Reşo bultena nûçeyên êvarê jî bernedida. Ji tiştên ku li dinyayê diqewimîn re jî eleqe nîşan dida. Dê û bavê Reşo jî wek her dem li cem çayê li ber televizyonê ji xwe re ji vir û wir deng dikirin. Reşo jî bi bûyerên li dinyayê ve mijûl bû. Guhe xwe li ser televizyonê bû.

Di nav nûçeyên wê êvarê de nûçeyekê bala Reşo kişand. Televizyona Alman bi vê sernivîsê nûçe dabû: *„Arteşa Iraqê bajarê kurdan Helepçe bi bombeyên kîmyewî bombebaran kir.“*

Wênêyên însanên ku hatibûn kuştin di medya Alman de belav dibûn.

Bi sedhazaran însan ji cih û warê xwe reviyabûn. Di wê zivistana sar û seqem de li derva, bi çiya û baniyan ketibûn. Trajediyeke mezin bû. Perîşanî bû.

Reşo bi vê nûçeyê xof bû. Bi hezaran însanên xizan û belengaz bi tevî kal-pîr, jin û mêr, zar û zarok bi derdê canê xwe ketibûn. Berî her tiştî însanên bê guneh bûn. Lê ne tenê ew, ser de jî kurd bûn! Cara siftê bû ku di heqê kurdan da nûçeyek guhdar dikir.

Reşo berê xwe ber bi dê û bavê xwe kir û li wan mês kir.

Ew bi gilî û gazincên gund de ketibûn. Filanê wer kiriye û bêvanê ho kiriye.

Ew gilî û gazinc jî bi kurmancî dikirin ! Va çi îş bû?

Însanê niha di televizyonê de bi derdê canê xwe de ketibûn kurd bûn û dê û bavê Reşo jî bi kurmancî bi hev re deng dikirin.

Çi girêdanek di nava Helepçe û malbata wan de hebû ?

Dixwest mijarê fam bike, lê di aqilê xwe de nedikanî bû resmekî çêke.

Eleqa malbata wan, gundê wan bi Helepçe û kurdan çi bû?

Qey bajarekî kurdan jî dibe?

Bajarê kurdan çima li Iraqê bû?

Kurd kî bûn, çi bûn?

Kurdiya di televizyonê de çima fam nedikir ?

Serê Reşo bi van pirsana hatibû dagirtin.

Reşo careke din li dê û bavê xwe mês kir. Lê wana tu bertek nîşan nedabûn.

Wekî ku eleqa wan û kurdên Helepçe û Iraqê qet tune ye.

Ne xema wan bû!

Reşo li cem dê û bavê xwe bi awayekî bêdeng hinekî din rûniştˇ.

www.arsivakurd.org

Lê rihet jî nekir. Ji wir rabû çû oda xwe. Dixwest bi tenê be.

Li wir hinekî bi dersên dibistanê re mijûl bû. Lêbilem resim û wêneyên ji Helepçe û însanên ber bi çiya û baniyan ve reviyayî ji ber çavên Reşo nediçûn.

Bi xwe bi xwe difikirî.

Ew li Almanya di oda germ de bû, lê ew însanên feqîr û belengaz li derve, di bin berf û baranê de, di bin serma û seqemê de bûn.

Gerek ew tirseke çing be, ku bi sedhezaran însan gund, cîh û warên xwe, mal, milk û keda xwe ya bi salan li dû xwe bihêlin, biterkînin û berê xwe bidin çiyan?

Sûncê wan însana çi bû?

Ser de jî van însananan kurd bûn !

Wekî malbat û gundê Reşo jî! Belkî kurdên Helepçe meriyên wan bin jî.

Heta nîvê şevê gî zanebûnên xwe dida ser hev, lê bê feyde bû.

Reşo ji pirsên di aqilê xwe de bersiveke têr nedidît.

Dora din ya rojê, bûyera Helepce li dibistanê jî cihekî sereke girtibû.

Di dersa serbest de mamosteyê Alman bûyera Helepçe û kurdên Iraqê xistibû rojeva xwe.

Agahdariyên sereke yên di heqê kurdan, welatê wan, perçebûna wan û bêdewletbûna wan da.

Şagirtên alman hema bêje bi yekdengî bi xizaniya kurdan û rewşa wan re empatî dikirin.

Ders pir xweşiya Reşo çûbû.

Resmê di aqilê wî de tenekê din zelaltir bûbû. Şabûnek di dilê wî de peyda bûbû.

Bi wê şabûna di dilê xwe de, Reşo di dersê de destê xwe rakir:

– Ez jî kurd im. Lê ez ne ji Kurdistanê me. Ez ji gundekî Qonyayê me!

Mamosteyê alman ji Reşo re eşkere kir ku haya wî ji koloniyeke kurdan ya li nava Tirkiyê û Qonyayê tune ye.

Êdî di serê Reşo de pirsa kurdî cihekî mezin digirt.

Kurd kî bûn, kurd çi bûn, gundê wan çima li Qonyayê bû, çima wî tenê kurdiya Qonyayê fam dikir...? û hwd.

Reşo piştî dersê bi tev hevalên xwe ve çû qada futbolê.

Cihên ku Reşo derbe kiribûn ji berfê pak bûbûn.

www.arsivakurdi.org

Hevalên Reşo pir pê şa bûn ku qada futbolê ji berfê pak bûye.

Hevalên Reşo li pişt û milên wî xistin û ew pîroz kirin.

Hema wê deqê gogek peyda kirin, du tîm di nava hev de çêkirin û dest bi maça xwe ya siftê ya wê salê kirin.

Ku lîstina futbolê be Reşo pê dilîst. Lê di aqilê wî de pirsên di dema dawî de pê re çêbûyî jî bi awayekî her hebûn.

Gelo bersiva van pirsana kî dizanîbû?

Mamosteyê ku ji her tiştî re bersiva xwe heyî jî tam nizanîbû.

Di nav hevalên Reşo yên li dibistanê û futbolê de, ji her gelî hebûn lê kurdek di nava wan de tunebû.

Reşo di nav hevalên dibistan û futbolê de nikarîbû tiştê pê re mijûl dibe par ve bike.

Tevî van hest û pirsên di serê xwe de rêya mala xwe girt û çû malê.Reşo li malê tişt-mištê xwe bi cîh kir û çû cem diya xwe.

Diya Reşo jî weke herdem di aşxanê de bi kar û barê malê ve mijûl bû. Reşo ji diya xwe pirsî:

– Etê, em kurmanc in?

– Erê em kurmanc in.

– Em çima kurmanc in?

– Bav û kalên me kurmanc in! Eslê me kurmanc e, gundê me kurmanc e, loma em jî kurmanc in!

– Eleqa me û wan kurmancên Helepçe û yên din çi ye, ez çima kurmanciya kurdên din fam nakim?

– Çi dizanim, Min hay jê çi ye. Me ji dayik û bavê xwe û gundê xwe va zimana bihîst û em weng jî deng dikin. Ez wekî din nizanim. Çima, çir bû? Te niha jî cînên xwe kirin vî işî yoxsa?

– Etê, Saddam li Helepçe bombeyên kîmyewî barandiye. Bi hezaran însan hatine kuştin. Helepçe jî bajarekî kurda ye. Kurmancên Iraqê ji tirsa gî ji malên xwe reviyane û di vê zivistanê de li çiya û baniyan li ber sermê ne. Ew însanê me ne.

– Mala Saddam nekeve ha. Çima wer dike? Vicdansizî! Sûncê wan insana çi ye?

– Ku ez bizanim!

– Tiştên veng ji bavê xwe pirs ke.

Di wê navberê de bavê Reşo jî kete hundir. Ji kar hatibû. Dengkirina Reşo û diya wî jî bihîstibû.

www.arsivakurdi.org

– Hûn qala çi dikin?

– Bavo, em kurmanc in?

– Erê, em kurmanc in. Çima, çir bû?

– Saddam li Helepçe kurmanc bi bombeyên kîmyewî bombebaran kirine. Bi hezaran kurd hatine kuştin. Kurmancên Iraqê ji ber tirsa canê xwe bi çiya ketine. Ez jî meraq dikim, ka ew çiyê me dikin?

– Erê, rast e, em jî kurmanc in. Lê eleqa me û wan qet tune ye. Ew ji Iraqê ne, em ji Qonyayê ne. Zimanê wan jî ne mîna zimanê me ye. Em yek kelîmeyekê jî ji wan fam nakin. Her tiştê wan ji me cuda ye.

– Çima em ji zimanê wan fam nakin? Madem qet eleqa me û wan tune ye, hîngê çima bi me re û bi wan re dibên kurmanc?

– Kurmanc mîletekî qarişix e. Xudê dizane ka ermenî ne, suryanî ne, gawir in, misilman in. Tu serê xwe jî bi kurmanciyê zêde mêşîne. Va îşana tehlîkelî ne.

Şûna wê xwe bide ser dersên mektebê û meslegekî rind bixwîne. Ma tu paşê rihet bikî. Ji bo dinya heq jî xwe bide ser quran û îmanê. Ma tu li cenetê bi cîranê h.z. pêxember bî.

Kurmancî ne zik têr dike û ne jî tu pê dibî tiştekî. Kurmancî ya tim bela bîne deriyê te.

– Lê li kurmanca neheqî tê kirin. Zilm li wan tê kirin. Çima wer dibe?

– Ew ne problema me ye. Em kurmancên Qonyayê ne. Li Tirkiyê bi tirkan re wekî bira bi hev re dijîn. Em him kurmanc in û him jî tirk in. Li heqê kurdan gerek kurdên Dersimê lê bigerin. Kurmancên heqîqî ew in.

– Kurmancên heqîqî yên Dersimê ne?

– Tabî. Esil kurmanc ew in. Ê me hêleke me kurmanc e, hêleke me jî tirk e. Nijadperestî ne tiştekî rind e jî. Ya muhîm misilmantî ye. Misilman gî birayê hev in.

– Madem misilman gî birayê hev in Saddam çima Helepçe bombebaran dike?

– Ez wê nizanim. Heta niha min tu car navê Helepçe nebihistiye jî. Ew problema wan e.

Gava bavê Reşo qala kurdan dikir, te digo qey ew bi xwe qet ne kurd e.

Wekî ku qala mîletekî ji wan pir dûr dikir. Tim cudahiyên nava Kurdan dianî ziman.

www.arsivakurdi.org

Reşo jî li bendê bû ku bavê wi ji wî re qala têkiliya wan û kurdên li Helepçe bike.

Şûna wê cara siftê bihîst ku kurdên heqîqî û yên neheqîqî hene!

Reşo bê ku bersiva pirsên di aqilê xwe de bigre, rabû çû oda xwe.

Li wir gotinên bavê xwe careke din di aqilê xwe re derbas dikir. Li ser difikirî.

Wekî gotina bavê wî, eleqa malbata wan bi kurdên li Helepçe nebe jî, di ortê de trajediyeke însanî hebû.

Berî kurdbûna wan ew însan bûn û bê guneh bûn. Ser de jî misilman bûn. Madem misilmantî muhîm e wê çaxê xwedîderketinek li ser navê islamê îcab nedikir gelo? Him kurdên heqîqî û yên neheqîqî çi îş bû.

Lêbilem xuya bû ku va mesela, meseleyekî kûr bû.

Reşo jî qet dil nebû ku gotin û helwesta bavê xwe bi wî awayî qebûl bike.

Herim

Ezê herim
Dûv xwe nanêrim
Ma bimîne
Rêça lingên min
Li kolanên şevitî
Kûçeyên sar e

Ezê herim
Dûv xwe nanêrim
Ma bînin ziman
Di stranek zîz de
Salên bê bihar
Emrê minî tar û mar

Ezê herim
Dûv xwe nanêrim
Dilo nenale
Ma helbesta min
Di bilûra şivanekî de
Kûr kûr binale

Mem Xelîkan

www.arsivakurdi.org

PÊKENOK

Hizir Akbîna

Xwendewanên Bîrnebûnê ji we re merhaba! Berpirsiyarên kovara Bîrnebûnê va rûpela, ji bo pêkenok û mîzahê veqetandine. Edin em ê, di vê rûpelê da ji bo ken û mîzahê nivisa amade bikin. Siftê ken li ba me, bihaya xwe çî ye, însanên me li mîzah û kên çawa meze dikin, em ji bo yî vê çand şora bikinî.

Li Anatolîya Navîn, ji bo ken pir şor hatine gotin. Me li wan mêze kir ku pir xweşîya me jî neçû.

Mînak: Yên ji alîyê heval, an jî ji alîyê kesan va hatinî xapandin ra dibêjin; „Yê bi te kenî ne!“ Yan jî dibejin,

-„Pêkenokê te li vir in!“

Yên ku li her demê dikenin, derd û kulên cimatê nabînin ra dibejin;

-„Kenê bê ara (bênemûsa), tê li qula dîwara.

Kenê jina jî kêmasîyek bû, yan jî eyb bû. Wexta jinekê rind, jîr û xaş dipesînin ra digotin:

-Ne ya kennok e, ne jî gerrok e.

-Ne ya pîk pîkî, ne jî hîk hîkî.

Hevalên şên û şa re ken ne eyb e jî, ne guneh e jî. Li her demê ken ji bo însanên me mîna av û nên, tiştekî gereg bûye. Însanên me, vê geregbûna xwe nikarin veşêrin. Her demê însanên me ew heqê xwe yê kên îcra kirine. Xelkê Anatolîyê, xelkekî rûken e û di hûndirê wan de şênî û şahî hene. Li hemberî her zorê dîsa jî ji kên qet destbernedane. Li odayên gunda, di cimatê de li nav hev, bi hevdu ra henek dikirin. Li dawet û dola, şano bi qut îcra dikirin, teqlîda hewan û însana dikirin. Yek jî li daweta ji hevdu ra dûrik (mani) bi pertevî (bi êşandin) diavitine hev. Ez ji we re mînaka çand û hunera dawet û dola binivsînim.

DAWETA K..... Û K.....

Cîranêkî me, doleka xwe hebû. Çûn ji Kutlicamîyê du gevende anîn. Sê roj û sê şeva li dolê xistin. Me gîştika, bi keyfekî xweş temaşe kir û me guh da ser. Dor hat bûk derxistine, sê arebên hespa kişandin ber mala bûkê. Dema bûk derdixistin, li ser mala bûkê û mala zava pertevî diavitin hev. Li wir jî adet anin şûnê. Siftê ji axzê keçikê yekê got;

Çerçî tên ji çakira,
Barê xwe mûj û mûşkira,

www.arsivakurdi.org

Lawikî we berdûş e,
Keçika me malkir e.

Dor hat axzê zava û yek bi hirs derkete peşîya arebê hespa û dengê xwe bilind kir;

Berdûş lawê bavê te,
Hes ne cumê devî te ye,
Bûkê me ji nav heynin,
Yê din berdinê kirpîtê.

Ew jî çû, dîsa axzê bûkê yeka pir ji xasîyê diqarî derket;

Helîme tu were lez ke,
Berbîye xwe li arebê bar ke,
Qilêr û gamara te li hev da ma ye,
Keçikê me ancax te xelas ke.

Yekî pîr ji wan ra got; „paşîya we ne bi xêr e, bûka xwe heynin herin, hûnê dilî hevûdu bişkenin, bes e!...“

Axzê zêve qabûl nekir û gotin emê yeka din bejinî û herinî. Wan dûrikbêjê xwe, banga Avo kirin. Xalêkî Avo ji wan ra got;

– Aman ha! Avo dengkirin medin, Avo yê ortelixe li hev xwe.

Me cakê mêze kir ku, Avo hatîye li ber arebe yî. Avo ji wan ra got;

Haydana ha haydana,
Şekir kiriye çaydana,
Ç..... ne tu meriv bû,
A..... anî meydanê.

Bavê bûke ew dûrika Avo bîst û bi wî pir hêrs bû. Destê xwe avitê çêka xwe, got; “wî ji min ra bigirin, ez wî bûkijim.” Yên li dor û paş Avo heynan, ji nav dawetê derxistin. Bavê bûke got; keçikê min ji arebê dînin/peyakin, qe ezê vê bûkê ji vî derî derxim, bi şerda be, ji sisîya heta neha be.....” Cîrana destên xwe dan ser devî bavê bûkê, ma paşîyê sondê neke lê dîsan jî got;

– Ez keçikê xwe nadim. Cîrana ji ber tirsa wî dengê xwe nekirin û çûn. Di mizgeftê gund da civîn, gotin em vê bûkê çing derxinî? Çûn xoceyê sê gundan anîn, biryar dan. Ew ê bûkê veng biderxine:

Evarekê:
Yek: Bavê bûkê li mal nayê dinî,
Du: Ma şev reş be,
Sê: Wî derîyê gotin ra dermexin.
Êdin şora bavê anîne şûnê, bûk ji şîva bişûn da derxistin birin.

Hevalên hêja, henek û mîzahê demeka xwe, cîhekî xwe heye. Merîya ew baş amade nekir, henê pê bikenin, hen jî li me biqarin. Dema em heneka bikin, gereg e em li dorûpaş xwe mezekin. Kesên jê biêşên hene an na! We ew kir bişûnda henek tiştekî baş e. Ewna nebûn jî henekên me yên kirin, li dilê me da bipiçikin.

Bi dilê şa, bi çavên ziwa...

www.arsivakurdi.org

Li welatê min bihar tê

Hesen Huseyîn Denîz

Gava bihar tê Kurdistan bi rengên kesk, sor, zer, spî û binvşî dixemile.

Li zozanên wê ji bin berfa dihele soson û nêrgiz serî didin der. Li her buhistê avzêyek bi dengekî nerme giyayan dialêse û diherike. Refên kewan ji ser lat û zinaran xwe berdidin berberojkan û bi stranên evînî nav di xwe de didin û dildariya xwe diqebqibin.

Bi hezaran kêzik û kurmik ji qulên xwe dertên û xwe didin ber tava rojê. Morî paqijiya biharê dikin. Teyr û tilûr amadekariya danîna hêkan dikin, dixwazin li xwe zêde bikin. Sivoreyên rengîn ji qulên xwe yên di hundirê darên berûyan de çêkirine, derdikevin û didin pey hev...

Di wê kêliya ku roj diterise, av dibiriqe, xweza dicoşe, zindî tev li jiyaneke nû çavên xwe vedikin de girîniyek bi ser ezmanên welatê min dikeve. Girîniyeke ezmanan kerr û lal dike. Girîniyeke mirovan gêj û har dike. Girîniyeke zindiyan bê cih û war dike...

Piştre gurmîniyek û yeke din û yeke din. Qarewarek bi ser daristanan dikeve. Qîjewîjek ji her aliyî bilind dibe û pêtên agir...Her der disoje, rivînî wek gurên har êrîş dikin ser her tişta dikeve pêşberî wan. Her ku dadiqurtînin mezintir dibin, hartir dibin, dijwartir û zalimtir dibin.

Çûkên difirin, direvin nikarin hêk û hêlînên xwe bi xwe re bibin. Sivoreyên xwe ji qula xwe diavêjin der û baz didin, nikarin çêliyên xwe bixin hêmbêza xwe û bibin. Kîsoyên hewl didin baz bidin, nikarin xwe hilavêjin... mar û mişk, kêz û kurm xwe berdidin binê axê, kûr û hîn kûrtir dixwazin xwe berdin jêrê...

Çend hêlîn şewitîn? Çend hêk û çêlîk kizirîn? Çend teyr û tilûr bê bask ketin? Çend kêz û kurm bûn xwelî?

Darên kesk tev reş bûn. Giyayê teze tev bû pîşo. Fêkiyên li ser daran çilmisîn. Pel tev weşiyan. Qurmên daran bûn rejî, yek bi ser yekê de qulipîn erdê...

Ne sosin man, ne nêrgiz, ne beybûn, ne bilbizêq ... Avzê jî êdî naherikin. Roj rondikan dibarîne, serçavên xwe dinixumîne bi ewran, ew naxwaze vê dîmena kambax li bin baskên xwe bibîne. Ezman xwe tarî

www.arsivakurdi.org

dike bi şînkişandineke ji hêrsbûnê...

Belê, ev çîroka welatê min e ya her biharê cardin û cardin bi serê wê de tê...

Berê, di demên pir berê de li welatê min jî zarok rû-li-ken ji dayik dibûn. Dayikan bi stranên evîniyê dergûşên pitikên xwe dihejandin. Dapîran teşî dirist, bêrîvanan şîr dikeyand, koçeran li ser kaniyên zozanan tûzika dermanê dilan berhev dikirin. Keç û xortên ciwan ji sosin û beybûnan tacên rengîn dihûnan û didan serê xwe bi dorpêçkirina bayê evîniyê. Zozan bi kenên zarokan dixemilîn ên di bibûkên çavên wan de terisîna pêşerojê dida der. Hingiv diherikî ji qulên dar û deviyan...

Belê, ew jî biharek bû li welatê min.

Li welatê min bihar tên guhertin. Yek cih dide yekê. Li welatê min hîn ewrên reş û tarî digerin. Hîn gurmînî û qêrînî kêm nebûne ji ezmanên wê. Hîn jiyan serdest nebûye li hember mirinê. Lê welatê min nade girî, nakeve erdê, serûjêr nabe di vê biharê de. Ew her serî hil dide, hîn bi jortir û her ber bi jortir...

Çavên zarokan diterisin li welatê min, di vê biharê de. Lêvkeniyeke veşartî heye li ser lêvên wan ên şorbûyî. Bi xemgîniyeke hêvîdar li dûr dinêrin awirên wan. Bendên tirsê êdî çirandine tev bi hev re dar, ajal, kêz, kurm, teyr, tilûr, av, ax û zarok...

Li welatê min va ye dîsa bihar tê piştî zivistaneke tarî. Berf cihê xwe ji nêrgiz û sosinan re dihêle. Avzê di nav keskahiya nerme re bi reqisîn diherikin. Civeciva şalûl û bilbilan tê ji ser latên sor ên şahidên dîroka lehengiyan.

Çêlîkek çavên xwe vedike li dinyê, pitikek qêrîna yekem dide der li ser axa welatê min. Û jiyan dîsa didome. Jiyan bi înat didome. Qurmên bûne rejî şaxên teze didin der ên bi lêvkeniyeke keskê tarî. Pelçîmên têrav vedidin di serê bişkovkên xwe de. Kulîlkên rengîn rêz dibin li bilindayiyên zozanan. Refên kewan cardin xwe berdidin serkaniyan.

Li welatê min jiyan didome, li ser înata kuştinan, sotinan..

Li welatê min zarok dikenin, dibezin dipeyivin li ser înata qedexekirinan...

Li welatê min hêvî zindî dibe, li ser înata hêvîkujan...

Li welatê min bihar tê bi germahiya agirê Newrozan, li ser înata zivistanan...

www.arsivakurdi.org

Neynika qederê

Xizan Şîlan

ez
bi bîranînên cemidî
tijî me
li êvarên bêhnteng
pêsîrên hingoriya aso
dimijim
tîrêjên heyvê melûl melûl
dibiriqin
asîman xeman li hinava şewitî
dibarîne
berê xwe didim çolistanên ziwa
li ser rêya heqîqetê siwarê
hespê kumeyt im
eniya qedera mirineke bêwext
paç dikim
stûna jiyanê bi mij û dûmanê
qelişî
peleke keserkêş
ji salnameya temen şeqiya
tenêtiya min
cêwiyê êşa eşqa dilê bîrîndar e
pênûsa helbestê xwîn vedirişe
hemû bajar ketiye xewê

ez bi bêxewiyê
movikên pişta nîvê şevê
mizdidim
ewrên barana bi keder im
ramana okyanûsek har im
di mêjiyê min de derya
diçeliqe
mizawir li dor guhên min
fîtefît in
aramî û bextewarî
mişextî warên nediyar bûn
xerîbiyê
ez li ber dîwaran dîl girtim
hesretê kefenekî reşbelek
li bedena min pêça
tevna sebirê bi stranên bêrîkirinê
dihûnim
bi pêpelokên valahiya nava xwe
ber bi tava sibehê ve
hildikişim

2018-01-07
Stockholm

www.arsivakurdi.org

Çîroka mişkên kor

Mistoyê Heco

Hebû tune bû
Ne yek bû ne jî didu bûn
Çîrok çîroka sisêyan bû
***
Şev li ser şevê
Berxik li hembêza dê
Êk eksiyan dikin gîştik ketin ber bê
Di bin rona qemerî
Ling re diçûn histirî
Dikir çîrok distirî
***
Barê kerê heban e
Tê de pîvaz û nan e
Êk xwe ji çîrokê tîle ne feqîr e, nezan e

Ne zivistan bû, ne jî bihar bû. Ji havînê wêda payîza pêşîn bû. Lê çi payîz bû! Payîzeke pir germ bû. Li çolê ji german pişt li giyayên bejî şkestî bû û gîştik ji ripinên xwe de xiş bûbûn. Li ser rûyê axa çolê hilm ji tiştekî dernediket. Ên kêfdikirî tenê mişkên kor bûn. Çîroka me jî çîroka mişkên kor e.

Li neqeba oza bîra Eliyê Kesan sê heb mişkên kor hebûn. Yek ji wan dak bû, yên din jî çêliyên wê bûn. Zevî zeviya pincêr bû. Rêncberê zeviyê her ro bêyî navber, hînik ro nediçû ava dihat û motira avê ya pincêr dişuxiland. Dengê çirqeçirqê dixist guhê şirşirikên avê û di bin keskesora ji devê şirşirikan dipekî re berê xwe dida royê (ya diçû ava).

Silkan hê sira payîzê nexwaribû. Lewma êpî sist bûn û ew qes jî bi av û şîrîn bûn. Tam li gorî didanên çêliyan bûn. Çêliyan silk nola mewûj û mişqiran dixwarin. Kirpekirpa devê wan bi çirqeçirqa şirşirikan re dibû yek û di kuna mişkan de belav dibû. Rojan venganî, nola tûtika trênê dabû pey hev.

Haja mişkên kor ji ser rûyê herdê tûne bû. Di kuna xwe de hersêk bi hev re bêyî tirs û pir bi kêf bûn. Lê di wê pêşpayîza germ de ev zeviya şîn bo hin heywanên din jî bûbû mal. Êê... ev der di nav vê çola zuwa de nola waheyekê bû. Çi heywanên diz û heydûd hebûn hemûkan xwe bi wir digirt. Di wan rojên germ de roviyekî heydûd jî li wê zeviyê selitîbû. Çi li ber çavê wî diket talan dikir û dibir hêlîna xwe. Çi jînewerek didît ew derdest dikir û dibir zindana xwe. Pir neajot

www.arsivakurdi.org

roviyê heydûd kuna mişkên kor jî kip kir û kire çavê xwe.

Mişkên me yên kor şevekê bi dengê pencên rovî re, ji xew rabûn. Heta bi vir ve û bi wir ve bibezin çêliyek kete ber pencên rovî û ji qulika ku rovî kolandî re winda bû û çû. Daka reben zû bi ser xwe de hat û çêliya xwe ya din, a ji tirsan dilerizî kire hembêza xwe û ew di hembêza xwe de aşt kir. Paşingê bi heman lezê hinek xwelî berhev kir û bi wê axê qula ku rovî kolandî nola tûmikekî girt û çêliya xwe bi vê şiklê ji talûkeyeke din parast.

Devdevî êvarê rêncberê zeviyê tê, lê ji çi re tê. Di nava zeviyê de tûmikeke gipgir dibîne û yekser pê derdixe ku ew tûmik tûmika mişkê kor e. Kunên mişkên kor ji her dera xwe ve girtî ne. Quleke bi qasî serê derziyekê jî hebe cîlê wê qulikê nola tûmikekê digirin.

Rêncber cîlê dihere bêrekê û feqeke mişkan hiltîne û tê ser tûmikê re disekine. Radihêje bêra xwe û devê tûmikê vedide. Heta bigihêje kuna mişk bi bêrê dikole. Digihêje kunê û feqa xwe lê datîne. Çêliya me ya doh êvarî bala xwe dabû dakê xwe, bo qula ku rêncbêr kolandî bigire xwelînê dicivîne serhev û bêhaj berê xwe dide feqê. Di wê navberê de koremişka dak bi bêhna zingara hesinê feqê ya di nav kunê de belavbûyî dihêse û tê xwe digihîne çêliya xwe ya xişîm. Wê radiwestîne. Koremişka dak xwedî tecrûbe bû. Wê ji biçûktiya xwe de dizanî ev bêhn ji çi tê. Erê ev bêhn ji hesinê feqê dihat. Û daka zana dizanî ku ew roviyê har ê îşev dîsa were talanê.

Daka me ji wê xweliya civandî mişkekî kor çêdike û datîne ber devê feqê û xwe dide benda roviyê har. Roj mala xwe bar dike û tarî dikeve herdê. Roviyê me yê har dide lotikan û tê ber devê qulikê. Çavekî xwe miç dike û li qulikê dinêre û mişkê devê qulikê dibîne. Çing pêka xwe ya rastê diavêje devê qulikê feq dike şîrrreeeeqqq. Bi kûzîniyeke biêş rovî xwe li ezmanan dixe. Bi sê lingan bazdide û direve. Mişkên me yên kor xwe bi dengê kûziniya roviyê sêling digirin û kuna xwe ber bi zindana rovî ve dirêj dikin. Xwe digihînin zindanê û çêliya dîlgirtî jê xilas dikin.

Hersê mişkên me yên kor kuna xwe diguhêrînin û diçin zeviyeke din.

Çîroka min çû rast min xwar sîniyek mast.

www.arsivakurdi.org

Navên merivan ên taybet

Memduh Selim

Cûdatiya civakan yek jî navên taybet in. Navên taybet, ji bo civakan taybetmendîyeke girîng e. Her civak gora kevneşopiyên xwe, gora hînbûyîna xwe, gora zarave û zimanê xwe, gora jiyana xwe, navên taybet didin zarokên xwe, çiyayên xwe, bajar û gundên xwe.

Di navên taybet de, navên merivan jî cihekî girîng digirin. Ji ber ku di nav her civakekê de navên gora taybetîya wana hene û cûda cûda ne. Ji bo wê navên merivan yên taybet, bi tenê ne veqetandina merivan e, veqetandina civakan e jî. Pir deman meriv navekî insanekî bihîst, tehmîn dike ku, xudanê navê bihîstî ji kîjan netew an jî gelî ye. Mînak; navên bi "yan" xilas dibin, navê ermenîya nin, navên bi "los" diqedin navê yunanîya nin.

Eger em li ser dîroka kurdên Anatolîya Navin difikirin, lêkolînan çêdikinî, va cûdatîya navên merivan ên taybet ji me re, şewq/îşq e.

Navên merivan ên kurdên Anatolîya Navin, bi taybetî yek in an jî nêzikî navên kurdên Rojava* [1]ne. Va nezikbûyîn an ji wekhevbûyîna navên taybet, di navbera kurdên Anatolya Navin û kurdên Rojava, bi taybetî kurdên Efrînê de meritî ye, ji hev veqetandinê tîne bîra meriv. Navên Kurdên Anatoliya Navin û navên kurdên Rojava pir wek hev in.

Ez tehmîn dikim, li pirr gundên kurdên Anatoliya Navin, pirr meriv wisa difikirin. Pirr caran ez bûme şahîdê dema ku li Anatolya Navin, navên kurdên Rojava dibihîzin dibêjin; "Van navanan li gundê me jî he ne".

Nêzbûyîn, ne tenê li ser navên merivan ên taybet in. Zarave û devoka kurdîya kurdên Rojava û kurdên Anatoliya Navin jî, gelekî mîna hewudu ne. Ji bo wê van elementên çandî (navên merivan yên taybet, ziman û devok ...) yên kurdên Anatoliya Navin û kurdên

[1] Gotina kurdên Rojava wan salên dawîyê tê bikar anîn. Lê em dizanin ku cografîk û civakî navê wê heremê Kurdistana Rojava ye. Li ba xelkê navê wî derî Çîyayê Kurmênç e.

www.arsivakurdi.org

Rojava gelekî nêzikî hev dike. Ji bo wê bi dîtina min dê û bavên kurdên Anatoliya navin, ji perçeyê Kurdistanê, jî Rojava koçber in. Ez dixwazim li ser navên merivan, ên taybet mînakekê ji gundekî Kurdên Anatoliya Navin ji we re binîvisim.

Hêvi dikim van navan, wê ji bo welatê dê û bavan ve, kal û pîran ve, di mejûye we de, ji bo dîroka wan ji welat koçberiyê xeyal û xeman çêke.

Navên merivan ên taybet ji gundê Bulduq;

Bilê Horo, (li Efrinê hunermendekî navdar; Cemil Horo)

Piçê Bêzo,	Omê Palo,	Bekê Mircê,
Osê Lapo,	Bilê Komê,	Yaxê Amê,
Millê Aliko,	Bereme Kurdê,	Mehmedê Zollê,
Eşa Zelo,	Evê Humikê,	Hemê Hecimille,
Mamê Tozê,	Zêva Gomê,	Bêremê Qamanê,
Osê Gulê Etto,	Reşoyê Hemê,	Hecî Kalo,
Hecîyê Bekê,	Zêva Fatsorê,	Eşa Mîrê,
Aloyê Heskûrê,	Milê Hemreşê,	Hîloyê Henê,
Omerê Osê,	Osê Xelê,	Mîrê Xecî,
Zexa Besinê,	Fata Balo,	Bilê Şarê,
Hesê Remo,	Etemê Reso,	Cumoyê Hêzeli,
Bekirê Îdê,	Mihê Alê,	Zêva Têrikî,
Bengê Kalo,	Xelê Şilikê,	Eşa Hemcarê.

www.arsivakurdi.org

PEZNAME:
Kultura pez bixwedîkrinê û berên wê
Çend nav û navlêkirinên li ba kurdên Anatolîyayê yên ku bi kurmancî deng dikin

Nuh Ateş
nuhates@web.de

Pez yanê mî û bizin berê ajalên (heywanên) bejî bûn. Yanzdeh hezar salan di ber vê, ew li cografîya Kurdistanê, li Bakûrê Rojavaya Îranê, li Bakûrê Surîyayê û li Anatoliyayê hatine kedî kirin. Ji hîngê vir da, meriv ji goşt, çêrm, herî û şîrên wan bi giyanin. Ji ber û ji bo vê meriv wan bi xwedî dikin, ji sar û sermayan, ji gur û qiranan diparêzin.

Bi sedan salan dewara kurdên Deşta Anatolîyayê, bi taybetî jî li gundên bi ser qezayên Kulu, Înewî (Cihhanbeylî) û Haymane yên bi ser bajarên Konya û Ankarayê va, hetanî salên 60/70yî yên sedsala rabirtî pirtir bi pêz dibû. Li her gundekî mezin neh-deh kerî pez hebû, lê niha ji gundekî kerîyekdudu vidernakevin. Li wan deran pirtir pezê gewr û dûvgir dihat bixwedîkirin.

Pezê Kurdên Anatolîya Navîn pirtir mî bûn, bizin jî hewûn lê li gor mîyan pir kêm bûn. Pir kesan bizin nedidana derîyê xwe, mîna ku bibêjî ji bizinan heznekirinek hewû. Ji ber we ye ku li ba kurdên Anatolîyê pir caran peyva pez li şûna mî-mîyan dihê gotin.

Li cîh û warên kurdên Anatolîyayê bizin hen caran mîna heywanekî ne meqbûl û bi nişêtên neysiz û şeytanan dihatin hesibandin. Aşkere ye ku rabûn û rûniştinên mî û bizinê di hen cihêtan da ne mîna hev in. Mî li gor bizine giran, kehîl, tirsonek e û li gorê fermanê xwedîyan û şivanan dihere û tê. Belkî ji ber vê ye ku mî bi qimet, meqbûl û wekî meleyka dihatin/tên hesibandin. Lê bizin ne weng e. Meriv dikane wê mîna ajaleke ekis, qurnaz, hewas, bi înad, liserxwe, cansivik û wêrek bi nav bike.

Belku ji avûrûyên van xû û xisûsîyetan da ye ku navûdengê

www.arsivakurdi.org

mîyê rind û erênî û yê bizinê jî neçê derketiye. Nişêtên neysiz û şeytanan yên ku li hen deran li bizinê tên mahrkirin, bêşik li ser bingeha xurefe, nistî û bawerîyên kevn yên dînewarî peyda bûne.

Li ba kurdên Anatolîyayê ziman û kultura pezbixwedikirinê di wexta xwe da pir dewlemend bû. Ez bi xwe jî bûm şahîdê vê dewlemendîyê. Zarokatî û xortaniya min li gundê Xelika yê li deşta Anatolîyayê, li malbateke xwedîyê pêz da derbas bû. Min di xortanîya xwe da dûajotî kir û berx çêrandin. Heqê xwe ye ku ev dewlemendîya kultura pez bixwedîkirinê bihê nivîsandin û parastin. Bi vê nîyetê, viqasî ku di bîra min da maye û min ji qalkirin/sohbetên bi nas û hevalan va bihîstiye, min ev nivîsa nêzikî terza ferhengî hazir kir.

Ajal

Bejî

Kedî

Kedî kirin

Neysiz

Pez bi xwedîkirin/Bixwedîkirina pêz

Pezek

Kerî

Kerîyek pez

Kerîyek mî/mîh

Keriyek bizin

Birek pez

Semerek pez

Bêl/ Bêlek pez

Pezê mêh

Pezê stewr

Mîya/bizina bi suri/stru

Pezê gewr

Pezê seyîb

Pezê nêr

Mazman (Pezê qert û xesandî)

Xesandin

Beran

Beranê kel

Beranê bi suri/stru

Beranê kol

Beranê kûr

Beran berdan, li payîzê: Beran payizê demekê, hetani roja beran berdanê ji kerî tên veqatandin û di goma da tên besî/xwedîkirin. Roja beran berdanê ew û pezê mêh jî tên

Arengkirin û xemilandin û bi merasîm û haybêrîyeke beran ji gomê berdidan û dibirin li dawîya malan/goman, berdididan nav kerîyê

www.arsivakurdi.org

mîyan. Ew roja mîna cejnekê, şênahîya ber/mehsulê derbas dibû. Xwarinên xwaş çêdikirin û ciran, mermalî û şivan dawet dikirin

Areng

Areng kirin

Pêz areng kirin

Mî/Mîh

Mîya avis

Mîya sewr/stewr

Mîya beravêtî

Mîya guhbiper

Mîya geprep

Mîya stubigulî

Mîya belek

Mîya mor

Mîya serireş

Mîya guhbideq

Mîya serîbitûm

Mîya cêwî

Mîya cêwî zayî

Cêwî anîn

Mî/Pezê nêremok/nêremak

Berx

Berxa virinî

Berxa sêwî

Êmelik

Dûv gerandin

Gûzlek(Gwîzlek)

Hûkirina berxan ya çêrandin, birêçûn, bez û bazdanê: Gava ku berx û kar 1-2 mehî dibin, êdî wan carcaran ji bo demeke kurt ji koz û qolîtan berdidin û li dor û pêş malan, li derên ku çêre li rûstî, digerandin û hû dikirin birêçûn û çêrînê. Wê demê meriv dibû şahîdê bejîtîya wan. Wan xû û taybetîyên bejîtîyê yên ku ji hezaran salan vir da, di bîra wan da mayîbûn, dinimandin. Ew li dor û peş malan di şûna xwe da nedisekinîn, vir da û wê da bi lezeke nedîti, bi girmegirm û guregurekê, mîna ba ku ketiwe ber bivîlên wan, dibezîyan û xwe heldiavêtin, mîna ajalên bejî. Carcaran dadiwestîn û vesînîya xwe heldinan, fişefiş û bivîlavetina wan bû. Paşê, pêda pêda wan ev taybetîyên xwe yên ji dewranên bejîtîyê da mayî berdidan, cihdihiştin, yane kedî dibûn.

Qot bûn

Kalîna Berx û karan: Biçûkî berx û kar dikalin, li dayikên xwe digerin. Wexta dangkirinê ew û dayikên wan li hev digerin û pê ra jî dikalin.

Kavir

Kavirê nêr

www.arsivakurd.org

Kavira mêh

Xam: Mî bi xamî destpê zayîne dikin.

Berdîr

Bijajtîr/Bizaştîr

Yekberî

Duberî

Sêberî

Kêşk/kêşik/ kêşkê hev in

Bizin

Kar

Nêrî

Seyis

Gîsk/Gîsik

Cuwe

Pezê îzbend

îzbend kirin

Kulek/Pez û berxên kulek

Kulîn

Vegirtina nigên kulekan

Zayîna pêz

Zayîn

Xoşîn

Navik qetî

Pizan/pizdan

Pizan avêtin

Qoç/Goç kirin

Nipixîn/nepixîn

Gan

Mîya gandîr

Mîya Eke

Mijîn/Mêjîn/Mîtin

Mêjandin/Mijandin

Banîn/Lêbanîn/mîh li berxê banî

Mîya neban

Lê banandin/ şivên mî li berxê banand

Heş/hiş ji serê mîyê birin/çûyîn: Sewa lêbanandinê, mîya neban hetanî ku heş ji serî diçûn, di dorhev ra çerx dikirin û paşê, berx ji alî pişt û terîyê da di dûvê mîyê yê bi mîz didan û tozikek xwê lêdikirin û veng diavêtin ber mîyê, berdidan ganê wê. Mîyê halî xwe yî ku xwe bade tune, wê berx bîhn dikir, dialast û mîna nû zayîbe li berxa xwe dibanî.

Kolan/Tirb: Carina jî sewa banandina mîyê a li berxê, korteke çargoşeyî û nîv metroyî kûr viqasî ku mî têda bi cîh bibe, dikolan, jê ra kolan yan tirb jî digotin. Korta ku tê da mî li berxê tê banandin. Berx bi mîyê/dayikê va dikirin vê kortê. Mîyê di kortê da nedikanî

www.arsivakurdi.org

ku xwe bade, neçar dima û li berxa xwe dibanî.

Xoşban/Mîya xoşban: Mîya ku berxên din yên sêwîmayî jî berdide ganê xwe û dimêjîne.

Dang/ Dangkirin/Berx li mîyan dang bûn

Hoz ajotin/Hoz gerandin

Koza berx û Karan

Koz kirin

Qolît

Şîr mijîn/mîtin

Berx ji şîr birrîn (Li havînê)

Beremak kirin (Ji meha maha Gulanê şûnda)

Cihûwarên ku pez lê dimê, lê tê dutin û hewandin/hewîn

Gom

Hevşo/hevşî

Mexel/mexelê pêz

Mexel hatin

Mexel kirin

Pez kişandin mêxel/fêzê

Pez ji mêxel rakirin/kişandin

Fêz

Pez şevin kirin

Kûwîyê/Kûyê/Pez ketiye kûwîyê

Kewijîn/Pez dikewije

Şeqebişeqeyî bûn

Dûv girtin/Pezê dûv girtî

Pezê pan/qilot bûyî

Pezê bi goşt/goşt girtî

Pezê jar

Xwêdanî

Kevirên xwêdanîyê

Tûrê/Tûrikê xwê

Destarê xwê herdinê

Şivan

Serşıvan

Dajo/Dûajo

Şûngerê şivana

Bi nowê çûyîna ber pêz

Kulavê şivana

Kûm/Kûlikê/Telika şivana ya ku ji rîs hatiye hunîn

Şalê şivana yê ristî

Vegerandina şalê şivan/şivên

Têr

Şiva/Çoyê şivên

Kevkon/Kevirkon/Kevirkonî

Bizbên/Bizbend

Şivanê hewas/xewsivik

Heqê Şivên: Berê, şûna pereyan, bedelê heqê şivanan; xwarin û vex-

www.arsivakurdi.org

warina wî, tutuna wî, kinc û merasê wî û herî, ard û bulgurê/sawar ji bo malbata wî bû.

Heqê şivên birrîn

Ragirtina şivanan

Nanê şivên/şivan

Xwarına şıvanan: Pir caran rûnpenêr, hek-pizav, bulxur-savar bû. Şîva şivanan ya meşhur, zade bulxur yê bi dûvê pêz hatiye kelandi bû. Dûvê pêz xwê lêdikirin û li aşxaneyê/odeyeke hênik bi darda dikirin û parçe bi parçe dikirin ber şîvan.

Cirî

Çarix

benê çarixê: sola/merasê/pêlavê şivana yê ku ji çermi ga/manga dihê çêkirin. Benî çarixê jî ji wi çermî çêdikirin. Di destpêkê da parçeyek ji çermî ga dikirin nav avê bi xwê, hetanî ku rind nerm dibû. Paşê kenarên wê bitûn qul dikirin û benî çarixi di van qulana ra derbas dikirin bi hev va girê didan û dikirin şekila merasan.

Dolax/Dorpêç: Ji bo kesê ku çarixê dike pê ra şûna goreya ji digrê. Ev ji ris tê hunan, bi panî bostûnivek û bi dirêjîyê nêzika nîvmetroyî ye. Şivan dolaxê li ningên xwe, ji pozî nigda bigre hetanî çokan/junîyan, dipêçin û benî dolaxê yê ku sewa vê hatiya hunîn ji pozî nigda bigre hetanî çok/jûniyan lê badidin û girê didin.

Dolax û benê dolaxê jî mîna bizbên, kevirkonî, tûrê xwê, tûrê bêrîyê ji herîya derdaw, binzik, dor dûv û ya ginciyên pêz, yanê ji herîya kêm biha tên çêkirin/hunîn.

Hawan

Cêr/Kwûz

Kêr/Kera Şivên

Asûn/Hesin

Kevirê hêste

Pîşo

Kûçikê şivana

Kûçikê xewsivik/hewas

Kûçikê no/nov

Kûçikê guh jêdikirî

Gur

Gurê no/nov: Gurî nov pêz bir bi bir dike, pira jê dikûje-veditisîne, tene yekê dibe/dixwe.

Çirîya şivên: Wexta gur dikeve nav pêz û wî birbibir dike, şivan dike çirî.

Kerê/Kera şivên

Palan/semer

Hefsarê kêr/kerê

www.arsivakurdi.org

Tûjikê Kêr/Kerê/Tûjikê kutanê

Gurexûr/Gûrexûr kirin (biwêj-navlêk): Wexta şivanan carna pezek didizîn; wan ew bi lez serjê dikirin û laş ji hev biderdixistin, parva dikirin û... Dizî û lez û şekila ku wan pê mî serjêdikirin, parva dikirin û dixwarin dişibanda ya guran.

Zengil (bi stûye pêz da dikirin)

Çang/Çan

Gumurdaq

Çarqirdaq/Liqliq

Zîl

Xurxuron/Xurxoron

Moriyên kesk-hêşin, Kepisk-kinêrk-nûsqe: Him sewa xemlandinê, him jî sewa nistîyan û bo çavên neçê bi stûye pez u berxan da dikirin.

Çêre û çêrandina pêz

Çêrîn

Kayîn

Çêrandin

Şivan û Dûajo di çêrandina pêz da, sewa ajotin, çerxkirin, kişandina mêxel/fêzê yan ser avê û xwedanîyê û sewa hewîn û hewandina pêz, deng û bangên pir çeşîd, fîtefîtê û firîskîyê, şiv û kevkonî (kevirkonî) bi kar tînîn. Çend nimûne:

Tuv kirin:Tuv, tuv, tuv: Banga pêz kirin sewa kişandina mêxel/fêzê yan ser avê û xwedanîyê.

Kîs kîs, yêr yêr/hêr hêr: Deng û bangên ji bo ajotin û çerxkirina pêz

Yex yex, ee ee: Bo ajaotin û çerxkirina bizinan

Kide kide: Bo ajotin û çerxkirina karan

Irrrek, irrrek, ehov: Li wexta ku pez dikişînîn ser avê tê gotin

Çirx çirx çirx: Li pezvedanê, wexta ku pezî bi şîr ji pezî stewr ji hev vedidin tê gotin

Navên şekil û şemayên çêrandina pêz:

Alêş kirin: Avayê gîraniya ku pez ji mêxel/fêzê radibe û destpê çêrinê dike.

Li gerem xistin/Bi geremî çêrîn: Çêrina/Çêrandina pêz ya bi şekila li rû hev rêzbûyî û bi qeyda giranîyê

Li ber hev şikênan: Gava ku pez, mîna ku ketive yarî/lacê bi lez diçêre lê bi qeydeya giranî bi rê dihere

Hemêl/Hemelî kirin: Gava berê pêz, bo çêrandinê didin gir û banîyan, berwar, nekew û keviyên newalan

www.arsivakurdi.org

Zik vi ser piştê ketin: Gava ku pêz pir têr dixwe û zikê wî diperçife û ji her du hêlan da beremberî piştê dibe

Pez zirq/rep bû dawestî: Ku pêz rind/pir têr xwar û dev ji çêrina berda û dawestî: Koyunların iyice doyup, durup/dikilmesi.

Delav bi delav gerandin: Gerandin/çêrandina pêz sewa li ber erx û çeman

Pez yêm/êm kirin

Hewzê pêz

Yêmê pêz: Zivistanan pez yêm dikirin, ka, gîyayê hîşkkiri û hêrdî, cêh, ulaf didan ber.

Pez derece kirin:

Pez firotin: Pezê nêr (kavir û mazman) pirtir ji bo firotinê bixwedî dikirin û dibirin li bazarên Semûl/ Stembûl û Anqereyê difirotin

Pez serjêkirin

Bêrî, pez dutin, şîr û berên wî

Dutin/Dotin/Doşîn

Pez dutin

Şîr doşîn/dutin

Pirtir jin û şivan pêz (mîh û bizin) didoşin

Helebî: Navlêkirina ji bo jin û mêrên ku pez rind didotin

Serê pêz girtin

Pez dan bêrî

Bidê: Ji bo pez dan bêrîyê, pezajotina li bêrîyê tê gotin

Berke bû: Peze bêrîyê bi dawî bû

Tûrê bêrîyê: Tûrê ku kesên ku pez didutin dikişînin ser jûniyên. Ji rîsê heriyê çêdikin

Helba/Elba şîr

Koşan: Girêdana mîyan li bêrîyê, sewa dutinê

Şirê mîyê

Şîrê zêç/ Axin: Şîrê mîyê yê siftê û li pêy zayînê ye. Ewî hendik tîr e, rengê wî tozikê zer e:

Şîrê parzinî

Parzin/Parzina cawinî

Şîrê qetî

Kela şîr çûyîn/Şîrê kelçûyî

Şîrê yawan/biznî : Şîrê li makînê kirî/xistî û rûnê wî jê veqetandî

Şîrê meyî/meyandî

Mey

Meyîn

Meyandin

Givrik: Meya pênêr

Şîlav/Şîlavik: Riviyeke bi ser hûrî pêz/berxa va ye

www.arsivakurdi.org

Çêkirina givrik: Sewa vê, çaxên berê, berxeke virinî ya ku têr şîr mîtîye serjê dikirin. Şîlav jê dikirin û dişûştin. Şîrê gilebigile bûyî jê viderdixistin û ew jî dişûştin û tozikek xwê lêdikirin û bi şûnda dikirin şîlavê. Paşê dev li şîlavê girê didan û ew hîşk dibû, dibû givrik

Serçin/Penêr : Parçek ji givrikê wekî mey diavêtin nav şîrê yawan ê germkirî. Du-sê seatan şûnda, wexta ku şîr gilebigile dibû, ew dikirin parzinê û parzin girê didan û dikirin naberê du kevirên pan sewa ku av û sûjîyê xwe biarive. Du-sê seatan şûnda penêr (di vê qonaxê da jê ra digotin serçin) jê ji parzinê viderdixistin û di teştekê da bi destan lihevdixistin, hûrik-hûrik dikirin. Paşê ew gogbigog dikirin û bi qêwirme da, (yarê verûtî/bêpirç) berdidan û rind diavandin

Şûjîya pênêr/serçin

Serçin

Penêrê kûfikî

Tazmiq/Tazmix/haveyn

Mast

Çêkirina mêst: Şîrî dutî û parzinkirî/li parzinê xistî germ dikin û gaveke dadiwestînin, paşê têzmiq tevê dikin û ser dinixmînin, şevekê di ser ra derbas dikin

Çeqelme/Çeqleme

Şûjîya mêst

Aravtin

Rûn /Rwûn

Tort/Rûnê kwêyî/kêyî : Ji mastî bi qêmax/xavik çê dikirin

Kwêyîn/Kêyîn

Çolerûn/Çolik

Meşk

Gûçikên meşkê : Li pêşî dudu û li paşî ji dudu, tevehev çar gûçikên meşkê hene. Her cotek gûçik bi darekî ku nava wî bipanî viqasî sê tilîyan qûlkiri va girêdayi ne

Kêrî/kêrîya meşkê

Çatma/Sêling

Dew

Firuh

Tûrê mêst

Çîg : Rûn e yê ku ji şîrî li makinê kirî/xistî hatiyê veqetandin. Xwê lê çîg dikin û li dereke hênik bi şûn dikin/dinixmînin û carcaran li hev dixin. Paşê dikin yarê rûn

Yar/Eyar

Yarê rûn

www.arsivakurdi.org

Yarê penêr

Qêwirme /yarê verûtî/bêpirç/ rûtkiri : Yarê bi pirç di teştê da dikirin nav avê germ û xwêlêkiri. Kingê ku ew rind nerm bû, vedirûtin/rût dikirin

Pirtik/Yarê êrd

Hîz/Yarê bizinê : Mit/mot dikirinê

Post

Post kirin

Guran/Gurandin

Laş/Term û organên pêz

Çêrm

Serî

Hestiye sêrî

Serûpî/serûpê

Pê

Guh

Ziman

Poz

Kirtikê poz

Çav

Dev

Gep

Pûdi/pûvî

Didan

Qirik/Qaqirçî)

Rivsork/Rivsorik

Sû /Stû

Hestîyê sû/stû

Hestîyê piştê

Hestîyê kûnkê

Sîng

Pîle pêşî

Pîle paşî

Hêt

Bêrik

Kirtikê bêrikê

Terî/Terrî

Gun

Dûvê Beran û mîyan :

Cizirik

Boç/Boçik

Kaw/Kab

Kawlîstin/ Bi kaw lîstin

Sim

Gûsik/Gwîsik

Parsî

Parxane

Tişte Navzik/Navgîn

Pişik/Pişk

Gûrçik

www.arsivakurdi.org

Dil

Kezew

Fatereşk/Fatereşik

Bez

Dwûn/dûn

Hûr

Hûrpûrtik

Zafran

Çelpirtik

Rivi

Riviya bi bez

Gan

Gun

Sersî: Goştê xwêlêkirî li ber rê/rojê hîşk kirî. Paşê dikin hurê pêz û bi darda dikin û zivistanê dikin ber şîvan

Bira pêz: (Maha Heziranê)

Heri/Herî/Hirî

Fîlik

Qusîn/qusandin

Qusas/qusisî

Hebring

Benê ningê/lingê pêz

Balyê/Tûrê/ Çalê/Çwalê herîyê

Herî şûştin

Herî kutan bi toqêç/şûnik

Herî rêxistin û zîwa kirin

Heri vebiçirandin

Heri şikinîn

Heri şêkirin/Herî li şê xistin

Kûlî

Kûlî bi teşîyê ristin

Rîs

Gilok

Ber/berhemên ku bi rîs tên çêkirin: Gore, lepik, fanile, xalî, balif, heqîv, gelt, hecal, xeleya sipîbelek, ber...

Herî belavkirin: Bira pêz ji bo kurikan/zarokan dibû şênahî. Kurik li cîyê pezbirê dicivîyan. Xwedîyên pêz, sewa xêr û bereketê herî li wan belav dikirin. Kurikan bi herîyê ji çerçîyan mûj/mêwîj, mişmiş, lewlewî, tû û hêjîr distandin û pê şa û sermest dibûn.

Gincî

Herîya gincîyan

Reşemîz

Reşemîz avêtiye xwe: Li baharê, gava ku pez bi çêrê û giyayên pirçêşîd çê dibe, reşemîzê diavê derdorê dûv û nigên xwe.

www.arsivakurdi.org

Durû/Durûv kirin/Nîşan kirin/Nîşan lêxistin

Her malbateke ku pezî xwe pir, ji bo nasîn û nasandina wan, ew durûv/nîşan dikirin. Her malbatekê durûvekî xwe yê xas/cihê hewû.

Çeşîtên durûvkirinê/Nîşankirinê:

- Bi kêrê ji peş yan ji paş û pozê guhê berxan parçekî piçûk jê dikin yan guh qul dikin yan jî serî guh tozikê diqeliştin.
- Bi hesinekî zirav û qilot'puz yê ku di êr da sorkiri pozê pêz dax dikirin.
- Ran/Pîlê pêşîyê, yan jî alîyê jorî dûvê pêz bi katranê, bi qasî dirêjî û panîya du tilîyan dihê qetran/nişan kirin.
- -Yên ku pezî xwe hendik, ya ew rind di çavên xwe ra dikirin, ya jî bi civît û bi rengên çeşît ew nişan dikirin.

Hêjmartina keriyên pêz bi zo û fer

Zo: Cut/cot

Fer: Yek

Çaxên berê keriyên pêz bi zo û fer dihatin hêjmartin. Meriv dikane bibê, di encamêde, bi zo û zo (cot bi cot) dihêjmartin. Çinkî di pêdaçûyina hêjmartina bi zo fer da, her ku ferek li ferekê zêde dibû yanê ku du fer dihêştin hev ew dibûn zoyek û bi ser xaneya zoyê da dihate hesabkirin. Belkî hêjmartina keriyên pez yên mezin bi hêjmartina zo û fer hîn hêsan/sivik dibû. Yanê zeman û zehmatên ku li hejmartina yek bi yek ya pencsed û bîst û pênc pezî dihê xerckirin ji ya hêjmartina cut bi cut zêdetir e. Nimûne: Yek zo, du zo, sê zo, sê zo ferek, çar zo, pênc zo, pênc zo ferek, şeş zo, heft zo,...., deh zo...., bîstyek zo ferek,...., 262 zo û ferek. Yanê 525 pez. Nizanim çima hêjmartina bi jimara zo û fer paşê hatiye cihîştin.

Nexwaşîyên pêz

Axirme: Pez pirçik dida û gep lê diwerîmin. Bi kevirê heşin (gozdaşı) dihatin derman kirin. Toza vî kevirî dikirin nav avê û didan pêz :

Zarêş

Bi xurnig ketin/Guhrepik : Guh diwermîn, rep diwûn. Carina guh hişk dibûn û jê da diketin. Derman kirin: Guh bi derzîyê der dikirin. Çima ye nizanim, digotin, mîyê reş bi vê nexwaşiyê nediketin.

Qirkirin/qirbûyîn

Kurmî bûn

www.arsivakurdi.org



Guri/Gurû bûn

Gene/gene ketin

Gene kûştin

Qirnaş

Efsinik

Qetran

Ardû /Tiştê bo şevatê :

Kerme binî pêz

Rixa pêz

Pişkul

Kix

Kûşkûr yên pêz

Kong

Zibil

Mainz, Almanya, adara 2018an



www.arsivakurd.org

Sê kes û sê kilam

Amedekar: Muzaffer Özgür

Wek tê zanîn di destpêka sedsala 20an de li Anatolîyê eşkîya gelek zêde bûbûn. Li Anatolîya navîn jî kes hebûn ku jiber sedemên cûrbecûr li hemberî dewleta tirka serîhilda bûn û li gund, çîya û banîya digerîn.

Dema şer xelas bû û dewleta nû hat avakirin û kontrola welat ket destên kemalîstan êdi jîyana eşkîyatîyê zehmet bûbû. Dewletê bangî wan dikir ku ma teslîm bibin û beşdarî sîstema nû bin. Lê her komê daxwazên wan qebûl nedikirin.

Li deşta Haymanê jî kesên bi nav û deng Xeloyê Deli Pepê, Mistoyê Tozo û Hecîyê Buxûrci bûn. Di sal 1924an de li gundê Tepeköyê Xeloyê Deli Pepê, Mistoyê Tozo û heval-hogirên wan bi lîstika dewletê hatin girtin. Ji ber ku tirsa dewletê li nav gund û bajerokên deşta Anatolîya Navîn belavbibe ew kes hatin kuştin û serîyên wan, ji laşê wan hatin jêkirin û gund bi gund bi ereba hespan hatin gerandin.

Heciyê Buxircî jî di sala 1933an de bi lîstik û derewen çend kesan teslimî dewletê bû. Hat ber dadgehê û liber sêdarê îdam kirin.

Li ser wan kesan cûrbecûr kilam di nav gel de belav dibin û heta hîro hatine. Me di kovara *Bîrnebûnê* de hinek ji van kilamana çapkirin lê kemasî hebûn. Birêz Serbûlent Kanat di CDya xwe ya bi navê "*Demê Berê/ Porgulîya Min*" de kilamên li ser her sê kesan berhevkirine û bi avayekî baş sitraye. Bi taybetî jî kilamên li ser Hecîyê Buxircî hatine gotin bi pir versîyona nin. Jiber ku di arşîva *Bîrnebûnê* de hebin û di pêşerojê de jibo lêkolînvana liber desta bin min, carek din amadekirin.

XELOYÊ DELİ PEPÊ

Xelîl Bego qurban mêrê Satê, mêrê Satê
Rabîyê ser te sêse(i)d siwarî vê hikûmatê
Xelîl Bego qurban min go here ser kerîk pezî xwe re gavike
Li Anqera şewitî biderxîne xeta xwe beratê
Xelîl Bego qurban berdê

www.arsivakurdi.org

Kevir-quçikê gundê Haymana şewitî neman
Gî li ber ningê xangê te bûn kêr e
Pezê Xelîl Begê min bizina fîlike
Ji Polatlîya şewitî da berdayê nîk bi nîke
Lo Xelîl Bego te ji xangê xwe kwîr(kor) bû ra xwe dipesinî
Te digo xangê xangê sêsid siwarî hikûmetê çîyê ji min ra hendike

Xelîl Bego qurban berdê
Kevir quçikê gundê Haymana şewitî neman
Gî li ber ningê xangê te bûn kêr e

Bejna zirav dara çamê
Qirikê gewre şûşê camê
Dinya ji Xelîl Begê min re nemayî
Bira kes xwe nepesîne ji kesî re namê

Xelîl Bego qurban berdê
Kevir quçikê gundê Haymana şewitî neman
Gî li ber ningê xangê te bûn kêr e

Gundê Palancîya bişewite ha li özê
Ji şîva da tê ye dengê topê motirlozê
Ar di mala qaymeqamê Haymanê keve
Koma du bira li cîhişt li ber ayazê

Xelîl Bego qurban berdê
Kevir quçikê gundê Haymana şewitî neman
Gî li ber ningê xangê te bûn kêr e

Gundê Terikan (Boğazkaya)-Haymana/Ankara

MİSTOYÊ TOZO

Misto qurban gundê Palancîya bişewite di cî kî teng da
Mawizera motirloza bihevra deng da
Sesid sîwarî rakirine ser Mistoyê Tozo
Et etê kirine beranê kosedaxê di xwîna sor da reng da
Xayîn qurbano va sibê yê sîyarekî min tê
Bi ser ketîyê bîhna barûtê
Hayfa min te ji bîr nakim ez wê rokê

www.arsivakurdi.org

Mistoyê Tozo sîyardibû peyadibû li yayla Kutê
Dê naliyo! dê kor bîyo!
Dê nalino! dê kor bûno!

Digo hêle hêle xangê hêle
Çêr lêhatê! Misto di nav herbê da nasekine li ser nêle
Keçê gulê kor bîyê serê birê me jêkirin
Heynan birin Anqera şewitî avetin ber Kêmêle
Xelo, Misto, Milazim hûnê bi jinin
Bira we hajê nebû sê qezayê bi we re dijminin
Xwedê bişewitîne mala komitanê Haymanê
Seriyê we jêkirin avêt ber Kêmêl go; vana seriyê eşqîyê mezinin
Dê nalino! Dê kor bîno! Dê naliyo!
Dê kor bîyo! Dê nalino! Dê kor bûno!

Gundê Terikan (Tepeköy)-Haymana/Ankara

HECÎ BUXURCÎ

Hecînko qurban bakî tê wo bakî şêne
Hecîyo qurban tirsa limine konê malê bavê min helşîne
Hecîyo qurban xwedê xeraw bike, bişevitîne mala mir-felekê
Hecîyo qurban ji me bidûr nêxist kêm nekir girî û şîne

Heldikişime serê gira mezdikime Heciyo lawo li çola, li kepira
Omerano li bextê we be Hecî min de yê berxwe
Sesid sîyarê hikûmetê mîna naxira
Hecîyo qurban habû habû kekê min habû
Hecîyo qurban kendira Mistefa Kemal lidar da babû
Hecîyo qurban celat kî bi penç pera ser sîngê te rûniştibû
Hecîyo qurban perçema reşê dirêj di henîya gewr da ta bi ta bû

Gundê Omera (Tavşançalı)-Kulu/Konya

Çavkanî: ji CD ya Serbülent Kanat ya bi navê Demê Berê / Porguliya min /Îdocan Produksôyon-2017

www.arsivakurdi.org

Dersên zimên:

Xelîl Birinî

Cinavka pirsyarîyê "kî, kê"

Berî her tiştî, divê em cînavka "kî, kê"yê serast bikin.
Cinavka "**kî**"bi lêkerên negerguhêz re tê bikaranîn. Bersiv bi gruba cînavka "**ez**"ê tê dayin.
Mînak: **kî** çû? Bersiv (**Ez** çûm.)

Balkêşî: Ku lêker negerguhêz be jî, cînavka "kî" di nava qalibê daçekê de bê bikaranin, Wê demê "kî" tê tewandin dibe "kê"
Mînak: Tu bi kê re çûyî? Bersiv (Ez bi wî re çûm.)
Di vê hevokê de lêkera "çûyin" negerguhêz e. Divîbû cînavka "kî" bê bikaranîn lê cînavka "kî"
di nav qalibê daçeka " bi.....re "yê de hatîye bikaranîn. Bûye "kê".
Cinavka "**kê**"bi lêkerên gerguhêz re tê bikaranîn.
Mînak: **kê** got? Bersiv: Min got.

Ki

Ki hat? Bersiv (Ew hat.)
Tu bi kê re çûyî? Bersiv (Ez bi wî re çûm.)
Tu ji kê re dibêjî? Bersiv (Ez ji wê/wî re dibêjim.)
Tu bi kê ve çûyî? Bersiv (Ez bi wî/wê ve çûm.)
Tu bi kîjanî ve çûyî? Bersiv (Ez bi wî ve çûm.)
Tu ji kîjanî re dikirî? Bersiv (Ez ji wî re dikirim.)
Tu ji kîjanê re dikirî? Bersiv (Ez ji wê re dikirim.)
Tu kîjanê dibî? Bersiv (Ez wê dibim.)
Tu çûyî kîjan bajarî? Bersiv (Ez çûm wî bajarî.)
Tu li dara kîjan sêvê dinêrî ? Bersiv (Ez li dara wê sêvê dinêrim.)
Tu ji kîjan sêvan dixwazî ? Bersiv (Ez ji wan sêvan dixwazim.)
Balkêşî: Peyva "kîjan" bi peywira cînavka pirsyarîyê, ku bireser be, bi gruba cînavka "ez" ê re nayê bi kar anîn.
Mînak:Te kijan bir? Bersiv (Min ew bir.)

www.arsivakurdi.org

Balkêşî:: Peyva "kîjan" bi peywira rengdêrê, hem bi gruba cînavka "ez" ê re hem jî bi gruba cinavka "min" ê re tê bi kar anîn.

Kê

Kê got? Bersiv (wê/wî got.)
Te kijan bir? Bersiv (min Ew bir.)
Te bi kê re nan xwar? Bersiv (min bi wî /wê re nan xwar.)
Te ji kê re got? Bersiv (min ji wê/wî re got.)
Te bi kê ve kir? Bersiv (min bi wî/wê ve kir.)
Te bi kîjanî ve kir? Bersiv (min bi wî ve kir.)
Te ji kîjanî re got? Bersiv (min ji wî re got.)
Te ji kîjanê re got? Bersiv (min ji wê re got.)
Te li kîjan bajarî nan xwar? Bersiv (min li wî bajarî nan xwar.)
Te li dara kîjan sêvê nêrî ? Bersiv (min li dara wê sêvê nêrî.)
Te ji kîjan sêvan dixwest ? Bersiv (min ji wan sêvan dixwest.)

Balkêşî: Peyva "kîjan" bi peywira cînavka pirsyarîyê, ku bireser be, bi gruba cînavka "min" ê re tê bi kar anîn.
Mînak:Te kijan bir? Bersiv (Min ew bir.)
Balkêşî:: Peyva "kîjan" bi peywira rengdêrê, hem bi gruba cînavka "ez" ê re hem jî bi gruba cinavka "min" ê re tê bi kar anîn.

Cinavka pirsyarîyê "kîjan"

Cinavka pirsyarîyê **"kîjan"** sadece bi gruba cinavka "min"ê re tê bi kar anîn.
Mînak: Te kîjan anî? Bersiv (Min ew anî.) Di şûna "kîjan"ê de "ew" tê bi kar anîn.
Balkêşî: Peyva "kîjan" bi peywira cînavka pirsyarîyê, ku bireser be, bi gruba cînavka "min" ê re tê bi kar anîn.

Tu li dara kîjan sêvê dinêrî ? Bersiv (Ez li dara wê sêvê dinêrim.)
Tu ji kîjan sêvan dixwazî ? Bersiv (Ez ji wan sêvan dixwazim.)

www.arsivakurdi.org

Balkêşî: Peyva "kîjan" bi peywira cînavka pirsyarîyê, ku bireser be, bi gruba cînavka "ez" ê re nayê bi kar anîn.
Mînak:Te kijan bir? Bersiv (Min ew bir.)
Balkêşî:: Peyva "kîjan" bi peywira rengdêrê, hem bi gruba cînavka "ez" ê re hem jî bi gruba cinavka "min" ê re tê bi kar anîn.

Rengdêra pirsyarîyê "kîjan"

Ku "**kîjan**" rengdêr be, bi herdu grubên cînavkan re jî tê bi kar anîn.
Mînak: Tu çûyî **kîjan** bajarî?Bersiv (**Ez** çûm wî bajarî.)
Te li **kîjan** bajarî nan xwar? Bersiv (**Min** li wî bajarî nan xwar.)
Balkêşî:: Peyva "kîjan" bi peywira rengdêrê, hem bi gruba cînavka "ez" ê re hem jî bi gruba cinavka "min" ê re tê bi kar anîn.

Cinavka pirsyarîyê "kîjanî û kîjanê"

Cînavkên **"kîjanî** û **kîjanê"** bi herdu celebên cînavkan re jî tên bi kar anîn.
Tu bi kîjanî ve çûyî? Bersiv (Ez bi wî ve çûm.)
Tu ji kîjanî re dikirî? Bersiv (Ez ji wî re dikirim.)
Tu ji kîjanê re dikirî? Bersiv (Ez ji wê re dikirim.)
Tu kîjanê dibî? Bersiv (Ez wê dibim.)

Te bi kîjanî ve kir? Bersiv (min bi wî ve kir.)
Te ji kîjanî re got? Bersiv (min ji wî re got.)
Te ji kîjanê re got? Bersiv (min ji wê re got.)

Qertafa li dawîya **"kîjanî** û **kîjanê"**qertafên zayendê ne. Eslê van hevokan waha ye.
Te ji kîjan zilamî re got? Tu kîjan keçikê dibî? Peyva "**zilamî û keçikê**" ketîye**."î" û** "ê"ya li dawîya **"zilamî û keçikê**" hatîye dawîya rengdêra "**kîjan**"ê. Rengdêra **"kijan**" bûye **"kîjanî** û **kîjanê" di peywira** cînavka pirsyarîyê de ye.

Balkêşî: Bersiva herdu celeban jî bi gruba "**min"ê "wî û wê**" ye.
Em dikarin vê bêjin: Cînavka **"kîjanî"** ji bo zayenda nêrîtîyê ye. Cînavka **"kîjanê"** ji bo zayenda mêyîtîyê ye.

www.arsivakurdi.org

Di hevokên navdêrî de bi gelemperi cinavka pirsyarîyê "**ki**" tê bi kar anîn. Bersiva cinavka pirsyarîyê "**kî**" yê bi gruba cinavka "**ez**" ê tê dayin.

Mînak: Kî zava ye? Bersiv: (Ew zava ye.)
Kî bûk e? Bersiv: (Ew bûk e.)
Kî şivan e? Bersiv: (Ew şivan e.)
Kî kebanî ye? Bersiv: (Ew kebanî ye.)

"kî, kê" soru zamirinin yazını

Herşeyden önce soru zamiri "**kî ve kê** " nin yazımını netleştirmek gerekiyor.

"**kî**" soru zamiri geçişsiz fiillerle kullanılır. Cevabı **"ez"** grubuyla sağlanır.

Örnek: **kî** çû? cevap (Ez çûm.)

Uyarı: Fiil geçişli olsa dahi, şayet "**kî**" edat grubu içerisinde kullanılmışsa o durumda "**kî**" bükümlü hale gelir ve "**kê**" ye dönüşür.

Örnek: Tu bi kê re çûyî? Bersiv (Ez bi wî/wê re çûm.)

Bu cümlede "çûyin" fiili geçişli değil. Cümlede "**kî**" soru zamiri kullanılmalıydı. Fakat cümledeki "**kî**" edat grubu"**bi.....re**" içinde kullanıldığı için bükümlü duruma gelerek "**kê**"ye dönüşmüş.

"**kê**" zamiri geçişli fiillerle kullanılır.

Örnek: **kê** got? cevap (Min got.)

"kîjan" soru zamirinin yazını

"**kîjan**" Soru zamiri sadece **"min"** grubuyla kullanılır.

Örnek**:** Te **kîjan** anî? Bersiv (Min ew anî.)

"**kîjan**" sözcüğünün yerine "**ew**" kullanılmış.

Uyarı "**kîjan**" soru zamiri, belirtili nesne görevinde ise "min" zamir grubuyla kullanılır.

"kîjan" soru sıfatının yazını

"kîjan" sözcüğü sıfat ise, her iki zamir grubuyla da kullanılır.

Örnek**: Tu** çûyî **kîjan** bajarî? Cevap, (**Ez** çûm wî bajarî.)

Te li **kîjan** bajarî nan xwar? Cevap, (**Min** li wî bajarî nan xwar.)

www.arsivakurdi.org

"kîjanê" ve" kîjanî" soru zamirinin yazını

"kîjanî û **kîjanê"** soru zamirleri her iki zamir gruplarıyla da kullanır.

Örnek:

Tu bi kîjanî ve çûyî? Cevap (Ez bi wî ve çûm.)
Tu ji kîjanî re dikirî? Cevap (Ez ji wî re dikirim.)
Tu ji kîjanê re dikirî? Cevap (Ez ji wê re dikirim.)
Tu kîjanê dibî? Cevap (Ez wê dibim.)

Te bi kîjanî ve kir? Cevap (min bi wî ve kir.)
Te ji kîjanî re got? Cevap (min ji wî re got.)
Te ji kîjanê re got? Cevap (min ji wê re got.)

"kîjanî û **kîjanê"**zamir gruplarının sonundaki "î ve ê" ekleri erilik, dişilik ekleridir.

Yukarıdaki cümleler aslında şöyledir:

Te ji kîjan **zilamî** re got?
Tu kîjan **keçikê** dibî?

Cümledeki "**zilamî ve keçikê**"sözcükleri düşmüş. Bu sözcüklerin sonundaki **"î"** ve "ê" ekleri **"kîjan**"sıfatının sonuna gelmiş. **"kîjanî** û **kîjanê" durumuna gelmiş. "kîjan"** sıfat, **"kîjanî ve kîjanê"** zamirine dönüşmüştür.

Uyarı: Her iki grubun cevabı da "**min"**grubuna ait **"wî, wê**" soru zamiri ile sağlanır.

Sonuç olarak şunu söyleyebiliriz: **"kîjanî"**zamiri erilik için, **"kîjanê"** zamiri dişilik için kullanılır.

İsim cümlelerinde genel olarak "**kî**" soru zamiri kullanılır.

"**kî**" soru zamirinin cevabı "**ez**" zamir grubu ile sağlanır.

Örnek: Kî zava ye? Cevap: (Ew zava ye.)
Kî bûk e? Cevap: (Ew bûk e.)
Kî şivan e? Cevap: (Ew şivan e.)
Kî kebanî ye? Cevap: (Ew kebanî ye.)

www.arsivakurdi.org

Bermekiyên kurd di kûraniya dîrokê da

-5-



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



Wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Xeleka Gotaran: **Kurd û Îslama Siyasî**

Sedemên serpêhatiya Bermekiyan

Serpêhatiya wezîrên *Bermekiyan* yên Kurd li ser destê xelîfe *Harûn El Reşîd,* serpêhatiya rêberê Kurd *Ebo Muslimê Xurasanî,* li ser destê xelîfe *El Mensor* (bapîrê Harûn) tîne bîra me. Tevî wê keda mezin ya *Xalidê Bermekî* di damezrandina *Dewleta Ebbasî* da, kurê wî *Yehya, Harûn El Reşîd* perwerde û hînî her tiştî kiribû; ji bo bergiriya li mafê wî yê xîlafetê, jiyana xwe xistibû metirsiyê û wisa ew gihandibû xîlafetê. Di dema ku *Harûn* di qesrên xwe da û di xeleka cariyên xwe da bi temamî ketibû nava jiyana keyf û muhbetê, *Yehya* û kurên wî hemiyan bi dilsozî kar û barê dewletê birêve dibirin. Wek diyarî li ser van hemû qenciyan perçiqandin bûbû para wan. Ka em bi hev ra sedemên vê serpêhatiyê bînin ber çavan.

Sedemên perçiqandinê:

Derbarê perçiqandina *Bermekiyan* sê gotûbêjên berbiçav hene:

Gotûbêja yekem:

Kurtahiya vê gotûbêjê ewe ku *Harûn El Reşîd* di dema lîstikan, guhdarkirina stranan û vewxarina mey û şerabê (inbît) da gelek hezdikir ku xwîşka wî jî *Ebbase* (hinekan jî gotiye: *Meymûne*) di rûniştinê da amade be û *Ce'hfer* jî li gel wan be. Daku ev tişt gengaz be, mehra Ce'hfer û Ebbaseyê bi awayekî teşeyî (şeklî) li hev birîn, bi mercê ku di rastiyê da bi hev ra nezewicin; ji ber ku di wê demê da Ereban – bi taybetî jî Haşimiyan –

www.arsivakurdi.org

mehirkirina keçên xwe li kesên ne Ereb wek eyb û şerm didîtin.

Ebbase pir aşiqî *Ce'hfer* bû û jê xwast ku bi nehînî bi hev ra bizewicin, lê belê *Ce'hfer* ev yek nepejirand. *Ebbaseyê* ji dayîka *Ce'hfer Ettabeyê* xwast ku wê wek cariyeka xwe ji Ce'hfer ra pêşkêş bike. *Dayîka Ceh'fer* ev yek nepejirand. *Ebbaseyê* destpêkir û gef li dayîka *Ce'fer* xwarin ku ewê wê têkbibe. *Dayîka Ce'hfer* neçar ma ku fermana wê bi cih bîne. Rabû ew wek carî derbas koşka *Ce'hfer* kir. *Ce'hfer* ji ber vexwarina meyê ne hişyar bû û rûyê *Ebbaseyê* bi temamî ne kifş bû. Piştî ku pêra raket, *Ebbaseyê* rûyê xwe kifş kir û xwe da naskirin. *Ce'hfer* ji dayîka xwe ra got: „***Bi Xwedê! Te ez erzan firotim***". Wisa, vê zewacê bi nehînî berdewam kir, du kurên *Ebbaseyê* çêbûn, yek bi navê Hesen û yek bi navê Husên; û ew herdu şandin bajarê Mekkê ku li wir, dûr ji ber çavên xelîfe, bên perwerdekirin.

Yehya kurê Xalid (bavê Ce'fer) berpirsiyarê parastina qesra xelîfe *Harûn* û kebaniyên wî bû. Wî dergahên qesrê kîp dikirin û kilît (mifte) li gel xwe dibirin. *Yehya* bi baldarî li *Zubeydeyê*, kebaniya *Harûn*, û cariyên wê, di ketin û derketina qesrê da pir miqate bû. Rabû *Zubeydeyê* li ba *Harûn* li *Yehya* kilî kir. Bi ser wê da *Yehya* baldariya xwe li ser wê û cariyên wê hên zêde şidand. Rabû *Zubeydeyê* xebera zewaca *Ebbaseyê* û *Ce'hfer* gihande *Harûn* û got ku du kurên wan hene û li Mekkê ne. Rabû *Harûn* kir ku dixwaze here hecê û sîxurên xwe şandin ku herdu zarokan bi cih bikin û dawî ew dîtin. *Harûn* ferman da ku *Ebbase* û herdu zarokên wê bên kuştin, wan têxin sindoqekê û di bin koşkeka qesrê da bêne veşartin. Di pey ra ferman da ku kesên di kuştinê da beşdar bûbûn jî bêne kuştin daku tikes bi vê mijarê nebihîse û êdî beryara xwe da ku koka *Bermekiyan* bîne û wan qirbike[1].

Gotûbêja duwem:

Xwediyê vê gotûbêjê *Ebo Muhemmed El Yezîdî* ye. Dibêjin ku ew ji hemiyan bêhtir derbarê mijara *Bermekiyan* agahdar bû. Kurtahiya vê çîrokê ewe – wek bi me ra jî derbas bû – ku *Yehya Bin Ebdullah El Elewî* li çiyayên *Deylem* (li başûrê *Derya Xezer*) serî li dijî *Dewleta Ebbasî* hildabû. Xelîfe vemirandina vê serhildanê dabû wezîrê xwe *El Fedil kurê Yehya Bermekî*; alîkariya leşkerî û diravî jî

[1] Ibin Xellikan, Wefeyat El E'yan, 1 / 334 – 335. El Itlidi, Newadir El Xulefa, çapa 2004, rûpel 172, 176 – 180.

www.arsivakurdi.org

dabû wî. *El Fedil* bi zimanekî nerm ji *Yehya El Elewî* ra nivîsandibû û ew razî kiribû ku xwe bispêre. Wî ji bo *Yehya* bawernameyeka fermî ji xelîfe standibû ku ewê neyê kuştin û bi hêminî bijî. Li ser wê, *Yehya El Elewî* xwe sparte *El Fedil* û ew anî Bexdadê. Xelîfe ev kes sparte *Ce'hfer* ku li ba xwe biparêze.

Di şevekê da *Ce'hfer* şande pey *Yehya El Elewî* daku ji wî hin agahdariyan li ser wê serhildanê wergire. *Yehya* got: „*Di mijara min da xwe ji xezeba Xweda biparêze û bila roja qiyametê pêximber Muhemmed nebe dijminê te; ez sûnd dixwim ku min ti tawanbarî nekirine ku ez seza li ser wergirim*". Rabû *Ce'fer* lê baniya, dilê xwe pê şewitî û jêra got: Tu kûda dixwazî here. *Yehya* got: Ez ditirsim ku careka din bême girtin. *Ce'hfer* çend kes pêra şandin û ew gihandin cihekî bi ewle li Bexdadê. Mizêwir û dijminên *Bermekiyan* ev nûçe gihandin xelîfe. Xelîfe wesand pey *Ce'hfer*, pêra bi dirêjahî axivî û li ser *Yehya* jê pirsî. *Ce'hfer* got: Ew wek berê ye. *Harûn* got: Bi jiyana min!. *Ce'hfer* pêşî rawestiya û paşê got: Min ew serbest berda, ji ber ku ti tirs ji wî nîne. *Harûn* got: "Te karekî baş kiriye û bi temamî li gor daxwaza mine". Gava *Ce'hfer* ji ba wî rabû, bi nêrînên xwe da pey wî û got: "*Bila Xweda min bikuje, heger ez te nekujim*"[2].

Gotûbêja sêhem:

Kurtahiya vê gotûbêjê ewe ku heyama *Bermekiyan* di wezaretê da gelek bi dirêjahî da. Her tiştekî ku bi dirêjahî da, mirov jê bêzar dibe. Dibêjin ku xelîfe hêz û kelîja wan dît û pirbûna saman û gundên wan, bedewiya qesrên wan, pirbûna xwedî-daxwazan li ber deriyên wan, bilindbûn û navdariya navê wan di nav gel da û spasiya xelkê ji wan ra li ber çavan bû. dibêjin ku *Yehya Bermekî* hemû daxwazên *Harûn* di kirîna cariyan, hin caran bi nirxên bêhtirî sedhezar dînar, bi cih nedihanîn. Ji adet û xweriska padîşahane ku naxwazin kesek li hember kelîj û desthilata wan hebe. Li hêla din, şopeka siyasî ya li dijî *Bermekiyan* hebû ku ji hinek Ereb û hinek Faris pêkdihat; nûçeyên derew afirandin û gihandin xelîfe; qencî û başiyên *Bermekiyan* veşartin, nebaşî û neqenciyên wan li ser ziman û di nava gel da belav kirin. Kesekî ji wan helbestek li ser

[2] Ibin Tebateba: El Fexri fil Adab El Sultaniye, çapa 1997, rûpel 207. El-Teberî, Tarix El-Teberî, 8/242. Ibin Xeldûn, Tarix Ibin Xeldûn, 3/280. Ibin El Jawzi, El Mutazam fi Tarix El Muluk wel Umem, 9 7128 – 129.

www.arsivakurdi.org

zimanê helbestvanekî ne diyar gihande xelîfe ku têda tê gotin:

Ji dilsozê Xweda ra û ji kesê ku çareserî û peyman li ser zemînê di dest da ye bêje:

Eve kurê *Yehya* êdî wek te bû padîşah ku di navbera we da cudahî nîne

Fermana te bi fermana wî ye û fermana wî nayê redkirin

Û qesrên wisa avakirine ku wek wan ne Farisan avakirine û ne jî li Hindê hene

Û em ditirsin ku ew cihê te û samanê te bistîne gava tu serê xwe deynî gorê

Helbet, mebest ji naveroka vê helbestê kurê *Yehya, Ce'hferê Bermekî* ye. Xelîfe ket bin bandora van peyvên mizêwiran û tirsiya ku *Bermekî* serdariyê ji wî û piştî wî ji zarokên wî bistînin. Rabû li çewtî û xeletiyên wan geriya ku di kû da sînorên xwe derbas kirine û biryar da ku wan qirbike[3].

Rastî çawa ye?

Dîroknasên lêkolîner ku *Ibin Xeldûn* yek ji wan kesane, gotûbêja yekem dûrî rastiyê dibînin, û dibînin ku ev gotûbêj derewe. Ji ber ku nayê aqilan, xelîfe *Harûn* rewa bike *Ce'hfer* û xwîşka wî di meclîsên şerab û lîskê da bêne ba hev. Ev li dijî fêrew û adetên erebî îslamî ye. Bi me ra derbas bû ku *Yehya Bermekî* çawa qesra xelîfe û kebaniyên wî diparast, çawa deriyên qesrê digirtin û kilît (mufte) li gel xwe dibirin û pir bi baldarî jin diparastin; di nav wan da *Zubeyde* kebaniya *Harûn* bi xwe jî. Hîngê dê çawa *Ebbase* derketibe û çûbe mala dayîka *Ce'hfer*? Û çawa dayîka *Ce'hfer* dê bi *Ebbaseyê* ra vê dek û dubareyê li ser kurê xwe di mijareka wisa tirsnak da bigerîne? Û çawa dê vê yekê ji malxiyê (mêrê) xwe *Yehya* veşêre? Gelo tê aqilan ku bi rastî *Ce'hfer* rûyê *Ebbaseyê* nasneke, tevî ku bi wan ra di meclîsa şerabê da rûdinişt[4]?

Dîroknasên lêkolîner sedema serpêhatiya *Bermekiyan* sedemeka siyasî dibînin û ji wê baweriyê ne ku serbestberdana *Ce'hfer* ji *Yehyayê El Elewî* ra ku ew kûda dixwaze here, hêşt ku *Harûn* bitirse, meyla *Bermekiyan* bêhtir bi ser malaba *Elewî* da be û piştî mirina wî xîlafetê bidin wan; bi taybetî jî, ji ber ku *Bermekî* li ser dewletê serdar bûn û xwedî saman û alîgir bûn. Rabû biryara xwe da ku wan ji xwe ra bike firavîn berî ku ew

[3] Ibin Xellikan, Wefeyat El E'yan, 1/ 335 – 336. . El Itlidi, Newadir El Xulefa, rûpel, 172 – 173. Ibin El-Esîr, El-Kamel fi Tarîx, 6/87.

[4] Ibin Xeldûn, Tarix Ibin Xeldûn, 1 /20 – 22.

www.arsivakurdi.org

wî ji xwe ra dikin xwarina êvarê. Ev jî ne dûrî aqilane. Berî wê jî xelîfe *Eseffah* wezîrê xwe *Ebo Seleme El Xellal* kuştibû û xelîfe *El Mensor* jî apê xwe *Ebdullah Bin Elî* û rêberê Kurd *Ebo Muslimê Xurasanî* jî kuştibûn.

Dibêjin ku *Harûn* mirovekî hestiyar bû û li gor wê tevdigeriya. Gava ji kesekî razî ba ast û saman dida wî û gava jê dienirî û dixeyidî yekser fermana kuştina wî dida. Hin dîroknasan gotiye ku *Harûn* paşê zanîbû zordarî li *Bermekiyan* kiriye û li ser kirinên xwe poşman bûbû û giriyaye. Gava li ba wî bi neqencî li ser *Bermekiyan* diaxivîn, ev helbest digot:

Bêbavno! Loman ji min nekin!

Ka werin! Hûn bi kar û barê wan rabin[5].

Mebesta wî dijberên *Bermekiyan* bûn. Maneya vê helbestê ewe, dev ji axaftina li dijî *Bermekiyan* berdin, hûn nikarin bigihînin asta wan. Heger sedema serpêhatiya *Bermekiyan* zewaca *Ebbaseyê* û *Ce'hfer* bûya, *Harûn* dê li xwe mikur nehata, poşman neba û negiriya.

Lê belê bûyerên serpêhatiyê çawa derbas bûn?

[5] El Itlidi, Newadir El Xulefa, rûpel 172 – 173, 175.

EFRÎN

Efrîna min
Efrînê
Xemilandîye bi darên zêtûnê
Dibên ji dil de birîndar e
Veke sîngê xwe
Bikevînim
Bi ramûsanan wê birînê

Efrîna min
Çav zêtûna min
Dest kujeran de stûxwar in
Şaxê darên te
Gurê boz û birçî
Ji şikefta xwe filitî
Sîya darên te de vedişêre
Barbarî û xwînxwarîya xwe

Efrîna min
Hêvîdar be
Serpîya ne keç û xortên te
Bendewar be
Ê xwe bigêhêjînin te
Wan lingên qirêj rakin
Ji ser sîngê te

Mem Xelîkan

www.arsivakurdi.org

Helbest

telakî porî min tenê jî sipî nebû
ne zikê min êşîya
ne jî dilê min şikeşt
min jî dîtîn çavsorên nas
ez jî nasdikim hostên weran kirinê
û qirkirinê
û
rî pîsên neyar
balafirên xwinxwar
tankên ku bi diranên xwe ye kufikî
axa me gemar û qilêrî dikirin û dikin
lê
ez serî xwe nekime ber xwe
û
destên xwe li ber xwe girê nedim
li pîştî kawa rêzan vohu manah
tarix û mîtolojîyêke dûr û dirêjê û kûr heyê
bi hovîtîya pênc û şeş angra mainyu
kawa
ne tarûmar dibe
ne jî dimirê

Seyfî Doğan

www.arsivakurdi.org

Bi Hecoyê Rişti ve hevpeyvîn
(Kurdên Hêlkecikî – Aksaray)

Mem Xelîkan

Hecoyê Rişti, sala 1945 an li gundê Alaxanê (Girêdayî Aksarayê) hatiyê dine. Dibistan yekemîn li gund xwendîye. Ya navîn û lîse jî, li Nevşehirê xwendîye. Dûva dest bi dibistana leşkerî (Harbiye) dike û sala 1966 an wek subayekî Cenderma Harbîyê xilas dike.

Wan salên dema şagirtê Harbîyê ye, bi xortên Kurd yên ku li zanîngahan ve hevûdu nasdikin. Cara pêşîn li Stenbolê, dûva li Ankarayê bi wan hevalên welatparêz ve, hevaltîya wî her çû pêşta dihere. Carek din jî, bi wanan re têkilîya vî qut nabe. Waya rewşa jî, ji bo vî pirr baş nabe.

Ji alîyê, sazîya ku ew têde ve ji bo wî dosya tên girtin. (Sakıncalı Personel). Di nav leşkerîyê de 11 salan kar dike. Sala 1977 an de, dema ew Sersedleşker (Yüzbaşı) wû îstifa dike û ji leşkerîyê vediqete. Dûva tê li Ankarayê bi cih û war dibe. Niha, li Ankarayê wek karmend jîyana xwe didomîne.

Kekê, tu yê ji min re behsa Kurdên Hêlkecikî bikî ? Kî ne, ji kê derê hatine.?

– Kurdên Hêlkecikî, 200-300 sal bere hemî (giştik) ji Amedê, ji doralîyê Pîranê hatine. Ji % 70-80 yî wanan Dimilî ne. Ji % 20-30



Hecoyê Rişti bi hevjina xwe ve

www.arsivakurdi.org

yî wanan jî kurmanc in. Ji eşîra Mirdêsî û Gawestî ne. Piranî gund, Zaza û Kurmanca cûda cûda ne. Hinek gund jî, mîna gundî me Kurmanc û Zaza tevhev dijîn.

Çima ji we re dibên Hêlkecikî?

– Kurdên heremê ku em huro ji re dibên Hêlkêcikî, sifte tên li Aksarayê bi cih û war dibin. Dûva, dema ku li Aklsarayê nexwaşîya Ta (Sıtma) derdikeve, ji bo ku xwe ji wê nexwaşîyê biparêzin, ji Aksarayê bi derdikevin û berve bilindîyan diherin. Tên li çiyayên derdora Aksarayê, doralîyê Çiyayê Hêlkecikî bi cih û war dibin. Li wan çiyana hêwan bi xwedîkirin jî hesene ye. Kurdên Hêlkecikî, navê xwe ji wan çiyana girtine.

Li heremê, çend gundên hêlkecikî hene û serjimara (Nufus) wanan çiqas e?

– Qasî çel gund hene. Serjimara Kurdên hêlkecikî yên li heremê, bi yên li navenda bajêr dijîn ve tev 40-50 hezar e.



Jîyan û aborîya wanan çawa ye?

– Ew jî, mîna Kurdên Anatoliya ye dijîne. Wana jî ziman, çand û folklora xwe ji bîrnekirine. Bi erf û edetên xwe, bi Kurdatîya xwe hetanî huro jîyan domandine û didomînin. Lê ji

www.kurdiwakurdi.org

1950yî wir de, dema dibistanên Tirk li gundan jihevkirin şûva, her çû ziman xirab dibe. Medya, TV, rêzefilm sêrkirin zexteke mezin ditene ser zimên. Aborîya wanan jî girêdayî Cotgarî û Hêwan xwedîkirinê ye. Hinek jî, li welatên bîyanî, li dervayî welat an jî li bajarên Tirkîyê yên mezin karkerî dikin. Pirr hendik yên bazirganîyê dikin jî hene.

Bawerîyên Hêlkecikan yên olî çi ne?

–Xelkê heremê, gellek oldar in. Giştik jî Sunnî – Hanefî ne.

Li heremê kesekî namdar, hunermend, şare hwd. heye?

–Walle keke, qet jî kesekî heremê yî Hêlkecikî namdar tune. Dema MSP, ji gundê me Ahmet Er bû şaredarê Aksarayê. Ji Hêlkecikan Ahmet Er bû vekîl çû meclîsê. Tu hunermendên me yên bi nav û deng tunen. Em li dol û dawetên xwe sazbenda ji Kurdistanê an jî ji kurdên Anatoliyayê tînin. Li şîna, her gundeki me yê here serxwaşîyê bide gundên cîran. Jinên şare, li şînan kilama dibên.

Kekê Heco, ji te re spas dikim ji bo vê sohbete, mala te ava.

– Ez ji te re spas dikim. Ji kovara Bîrnebûnê re serketinê dixwazim.



www.arsivakurdi.org

digotin gul û gulistan
deketim ser baxên gulan
tîrejên rojê nezîke min bûn
û
ez bi zarakî nerm dawet kirim
ez bûm sîwarê pelên tîrejên rojê
tunêyî wiqas dewlement bû ku
hêstirk dihatin hemcartin
tirêjen rojên nedikanîn
di keleke sîhên xanîyê bilind re derbas bibin
û kokên wanan ronî bike
zanebûnên kevn gemarî û bêkalîte
mest bûnêyên bêvicdan
li kolan û kûcan û li ezman li devhev dikelivîn
dûnê tamsarkî dibû
di ayînên da reqemên sewîyan li gel capika
wek sermayê hesibendin

Seyfî Doğan

www.arsivakurdi.org

Şîrîn Omaro

Duvêm pezî fodil, li devî kaxê
Keriye têne, mina axê
Duvêm çavî yarê te birijin
Te vexarîye ava kaxê
Duvêm de ware ware lo şîrin Omero
Tu xwadanê pezî qere lo
Duvêm ser bira mermer,çifte zeriya
Herdem dane ser birîya
Duvêm min dikir ramusanekê bi fodilê xwe de
Şew reş bu nagêm keriya
Duwêm de were were lo tu şîrin Omero
Tu xwadanê pezî qere lo
Duvêm derketîye pezî li tata lo
Şefaqê lêxist rohilato
Duvêm pezê fodil hat
bêxwadan e hat
Harimê me da mexel hato
Duvêm de were were şîrin Omero
Tu xwadenê pezî qere lo
Duwêm rohilato
Go îşlingî mavî
Min gora lingê te ristî
Duwêm sozak te li min ra dayî
Duwêm heta mirinê benda te me
De were were lo tu şîrin Omero
Du xwadanê pezî qere lo
Duwêm de were were lo tu şîrin Omero
Tu xwadenê çangî zer e
Min te nirî te nendirî
Ketim îtî oxir birî
Te kusura min nendirî
Duvêm de ware ware şîrin Omero
Ca bi birbangî derê were

Berhevkar: Şerwan K

www.arsivakurdi.org

Sedema belavbûna eşîrên kurdan

Amed Tîgrîs

Çend sedemên sereke û bingehîn hene ku her eşîr û êleke kurdan wusa li ser cografiyeke berfireh û mezin hatine jihevxistin, koçkirin û belavkirin. Wek ku mirov di vê nivîsara Bermekîyan de jî dibîne, ji wan sedeman yek jê olî ye. Ji dema ola yezdanî, zerdeştî, misilmantî ve kurdan olên serdestan zû bî zû û bi hêsanî qebûl nekirine û li ber xwe dane. Hêzên desthilatdarên demê ew neçar kirine ku ji ser ax, war û welatê bav û kalên xwe bar bikin û herin welatên dereke û biyanî.

Di dema barkirin û koçkirinê de hemû eşîr, qebîle û bavik bi hev re neçûne. Hinek ji wan neçar mane ku li ciyê xwe bimînin. Wek nimûne Zerdeşt dema ji Medyayê, ji bajarê Urmiyê koçê bajarê Belxê dike, hinek eşîr, êl û malbat bi wî re diçin, lê piraniya wan li ciyê xwe dimînin. Dîsa di navbera salên 367-375an de, di navbera Bizans û Persan de peymana pevguhertinê (taqas) tê îmzakirin. Bîzansî xiristiyanên herêma Nisêbînê tînin li Amedê ku di bin desthilatdariya Bizansiyên xiristiyan de ye, bi cî dikin. Herwusa Yezdaniyên derdora Amedê jî dibin li şûna wan xiristiyanên ku ji Nisêbî anîne bi cî dikin. Ev pevguhertin bi peyman hatiye qebûlkirin.[1]

Di dema ola îslamê de jî gelek êl û eşîr ji ber artêşa îslamê ji başûr ber bi bakur û Rojhilatê Kurdistan, Îran û Anatoliyê ve koç dikin. Harûnê Reşîd eşîrên kurdan tar û mar dike.

Sedemeke din jî, şertên şer û siyasî ne. Kurdistan ji berî mîladî ve ji ber axa xwe ya bi ber, ava xwe ya bi jiyandar û cografyaya xwe ya stratejîk, heyînên xwe yên giranbiha yên ser û bin erdê bûye qad û meydana şerê çavbirçî û zikbirçiyên zordest, dagîrker û împeryalan. Bi taybetî di serdemên çar împaratoriyên mezin de ku di zemanê cuda de, bi salan Kurdistanê dagîr û talan kirine, eşîr, êl û malbatên kurdan jendine û ji hevdu belav kirine.

Împaratoriya persan/sasanî, împaratoriya roma/bizansan, împaratoriya ereban a îslamî û împaratoriya osmaniyan Kurdistanê talan û wêran kirine. Van împaratoriyên

[1] Şevket Beysanoğlu, *Diyarbakır Tarihi cilt 1*, s. 116

www.arsivakurdi.org

dagîrker, di dema desthilatdariyên xwe de hinek êşîrên kurd jixwe re kirine esker, hinek ji xwe re kirine mertal û yên ku bi gotina wan nekirine û li hemberê wan rabûne ew ji hevdu belawela kirine. Hema hema her eşîrî perçe perçe û koçê welatekî dereke û dûr kirine ku carek din nikaribin bigehîne hev.

Harûnê Reşîd eşîrên Ebû Muslîm û Bermekî heta sînorê Bizans, Rusya, Moxol û Hindistanê dane koçkirin. Osmaniyan, birukiyên Qerecdaxê ji Amed û Siwêregê heta Rûsya, Xorasan, Qazakistanê sirgûn kirine. Herwusa Îzolî heta Filîstîn, Misir û Xorasanê hatine derbeder û tengezarkirin. Hinek eşîrên din koçberê Yemenê kirine. Hîn îro jî ew li Yemen û li Sûdanê li wîlayeta *Kurdo Fanî* dijîn.

Kurdên Sûdanê 800 sal berî niha di dema Selhedînê Eyûbî de, li wir bi cî bûne.[2] Wek me li jor jî behs kiribû Xelikî ji Xorasanê heta Başur û Anatoliya Navîn hatine belavkirin.[3] Piştî şerê Otlukbeyliyê (1473) Hesenê Dirêj paytextê xwe ji Amedê bar kiriye Tebrîzê. Wî bi tenê paytext bar nekir, herwusa wî bi xwe re gelek malbat, êl û eşîrên kurdan bi taybetî eşîra Dimbiliyan biriye li Rojhilatê Kurdistan û li Tebrîzê bi cî kirine.

Di dema Osmaniyan de, di sala 1691ê de, ji bo ku pêşî li êrîşên ereban bigirin, eşîrên kurdan koçî bajarên Reqa, Hema, Humûs û Munbîcê kirine. Dîsa 700 kesî bi geştiyan birine Qibrisê.[4]

Sedemeke din jî dewletên dagîrker ji hêz û yekîtiya eşîrên kurdan guman kirine, pelikandine, tirsane, loma yekîtiya civak û hêzên wan ji hev xistine û bêhêz kirine. Eşîrên kurdan ji ber ku jiyaneke koçerî jiyane, dewletên dagîrker bi taybetî di serdema Osmaniyan de nikaribûne kurdan kontrol bikin, mêr û xortan bigirin eskeriyê û bacê ji wan bistînin. Loma eşîrên kurdan ên koçer mecbûr kirine ku li gundan bi cî bibin ku adresên wan diyar bin.

Di dema Komara Tirkiyê de (1934) jî biderxistina *Qanûna* Îskanê li Bakur gelek êl û eşîrên kurdan hatine sirgûnkirin.[5]

Sedemên perçebûna eşîrên kurdan yek jê jî, şerên eşîrtiyê yê navxweyî ye. Doza mêrkuştin û xwînî ye. Şerên giran û mezin di nav gelek eşîrên kurdan de çêbûne. Hinek ji wan neçar mane ku ji herêma xwe koç bikin.

[2] Özgür Gündem, Sudan'daki Kürtler, 09 Nisan 2015
[3] Malpera *Çandname*, 27.12. 2016
[4] Dr– Mustarfa Gökpınar & Ali Can Geliş, *LEK KÜRTLERİ Çukurova Lekvanikileri, Haymana Lek* Şahbazanları, *Bingöl Bermeki Lekleri*, s. 184, 186, Do Yaınları-2016
[5] İsmail Beşikçi, Kürtlerin *Mecburi İskanı*, Bilim yöntemi, s. 134

www.arsivakurdi.org

Mustafa KIZILKAYA



Di sala 1960î, li Încovê hatiye dunê. Încov berî qanûna ***Büyük Şehir***ê gundeki mezinî bi nav û deng bû. Ji bo gundên derûdorê, Încov wek navendek bû. Ji alîyê ekonomî û sosyal de bajarokekî girîng bû. Îro Încov bûye meheleka Cîhanbeylîyê. Ji bo vê jî falîyetên ekonomîk û civakî li herêmê nemane. Karûbarên ku li Încovê dihatin halkirin niha li Cîhanbeylîyê an jî li Konyayê têne kirin.

Berê însanên ji gundên derûdora Încovê ji bo îşên xwe dihatin Încovê bi zimanê xwe, bi kurdî li belediyê û li dukana deng dikirin. Têkîlîyên gundan bi hev re baş bû û însanan ev nas dikirin û danûstendineka germ hebû.

Mistefa salên xwe yên ciwaniyê li Încovê derbas kiriye. Wî jî wekî piranîya xortên kurd, berê xwe daye xerîbîyê. Li gelek welatên Ewropayê gerîyaye. Niha li Swêdê li bajarê Stockholmê dijî.

Gawestîyan yekem berhema wî ye ku li Stenbolê, 2016an de di nav weşanên *Deng*ê de hatiye weşandin.

Edîtor



Çavhêşîn

Rabe rabe çavheşinê
Di lingan de sola mêşînê
Serê govendê dikişînê
Nazenînê xwe naêşînê

Keç û xort rabûn dilanê
Wekî baz û weke teyran e
Mina şêrên ser çiyan e
Tu runiştiye li seyranê

Bûka delal sîwara hespê
Bêhna gulan li bejna te tê
Dengê def û zirnê xweş tê
Tu xezala êlên deştê

Ev helbest ji kîtêba *Gawestîyan* hatîye wergirtin

www.arsivakurdi.org

Du kitêbên nû ji weşanxaneya APECê

Jiyana Dayîka Sakîne ji aliyê doz û mafê jinan de mînaka civata kurda ya feodal û pederşahî ye. Jineke bi serê xwe çawa dikare di nav civat û malbateke hewqas muhafazakar û zilmkar de, ji biçûkiya xwe ve heta dawiya temenê xwe bijî. Ew çawa dikare li hember zilma mêr û malbatê xwe rabigire, li ber xwe bide û sebir bike. Sebra Dayika Sakîne ji sebra Eyûb Pêxember jî firehtir e.

Dayîka Sakîne jineke xwedî vîn, têkoşîn û mirovhez e. Di dema Şêx Seîd de malbata wê ji alîyê dewletê ve hatiye kuştin, zindan û sirgûnkirin. Di van 30-40 salên dawî de pênc zarokên wê jî hatine qetilkirin. Dîsa jî ew ne li peyî kîn û tolgirtinê ye. Ew li peyî aştî û baştiyê ye. Dayîkeka dilovan û lêborîner e. Ew ji ber vê karakter û taybetmendiya xwe, di nav rêxistina Dayikên Aştiyê de ciyê xwe girtiye. Ew aştî, demokrasî, wekheviya gelan, jin û mêran diparêze.



.... Dîroka eşîra bermekiyan heta avakirina Împaratoriya Medyayê diçe. Ew kurdên herêma bajarê Urmiyê ne. Min li ser Bermekiyan gelek çavkaniyên cuda û tevlihev bi dest xistin. Di van çend salên dawî de, di derheqê Bermekiyan de hinek çavkaniyên nû ji erebî û farisî hatine wergerandin. Min fêde û hêzeke mezin ji van çavkaniyan girt û hewl da ku ez li ser mijara Bermekiyan lêkolîneke biçûk bikim ka bi rastî Bermekî kî ne, li ku bûne, ji ku hatine û di serdema me de nevîçirkên wan li kîjan dewlet, herêm, bajar û bajarokan dijîn. ... *ji pêşgotina nivîskar*



www.arsivakurdi.org



Şêra Eyşê, ji Xelka Qerecdaxê

http://birnebun.eu